


# OROJA NÛ

*kovara huneri çandi û edebi*



MISTEFA BUDAK - 1940

12  
1986

## NAVEROK

Jı Xwendevanan . . . . .	3
Cîvin Jı Bo Şehidên Kurdistan . . . . .	4
Hevrê Apê Selim Jiyana Xwe Bo Azadi û Sosyalizmê Da . . . . .	5
Çend Gotin lî Ser Weşanên Periyodik û Rola Kovara Roja Nû . . . . .	7
Azadixwazê Cihanê Binyamin Moloise	
Jı Bir Nakin . . . . .	13
Newroz . . . . .	16
Kê Mehmût Perwêr Kuşt . . . . .	18
Ragirtin . . . . .	21
Beşdarbûna Çend Kurdan Dî Kongra	
PYKS' Da . . . . .	25
Pirê û Mamê Rovi . . . . .	26
Tiyatroke Muzyikal . . . . .	28
Kuştina Olof Palme . . . . .	29
Jı Nav Weşanên Nû . . . . .	30

Saf: 7  
Hejmar: 55

XWEDİ : KOMKAR - Swèd  
BERPIRSİYAR : Şeroyê BOTAN  
NAVNIŞAN : Döbelnsgatan 16 B  
113 58 STOCKHOLM  
TELEFON : 08 / 32 82 51  
HESAP NO : PG. 458980 - 0

UTGIVARE : Svensk-Kurdiska  
Arbetar Föreningen  
ANSVARIG UTGIVARE : Ş. BOTAN  
ADRESS : Döbelnsgatan 16 B  
113 58 STOCKHOLM  
TELEFON : 08 / 32 82 51  
PG : 458980 - 0

## HEVALNO !

Komela "Ji Bo Mafêñ Mirovi û Yekiti, Ji bo Rizgariya Gelan" li Yuwnan, ji bo alikariya "Dengê Radiyoya Kurdistan" kampanyeke bexşisan vekir. Ji ber vekirina vê kampan-yê wusan ji belavokek hate weşandin. Dî belavokê da hatiye diyar kîrm, weki "Koka Kurdistan dice dîghêje Kardukan. Dî pirtuka niviskarê Yuwnan Kesnefon'da(Paştahatina Deh Hezaran) li ser Kardukan hatiye nivisandin, ewana bi serbest jiyine, niha ji ketine bin nirê hêzên kolonyalist". Dî dawiya belavokê de alikari û piştgirtin ji bo gelê Kurd tê hê-vikirin.

Ji aliyê din me nivisara bi navê "Şer Lî Diji Terorizmê û Seroktiya Tevgerê" ya ku di nav rûpelên kovara Riya Azadi da hatibû nivisandin(hejmar 41) me wergerande bi zimanê Yuwnani. Me nivisar, ji hemû rojname, kovar, rêxistinê pêşveru ra şand. Vê yekê geleki bala yuwnanan kişande ser xwe.

Ji aliyê din, me broşura li ser Kemalizmê, "Kulilkêñ kurdistanê", "Demokrasi an ji Faşizma Rû bi Xêli" û "Prosesen Perwerdegarîyê Lî Kurdistanê" wergerandine bi zimanê yuwnani, em niha bi çapa wan va mijûl dîbin, em bawer dîkin ewê di nav meha Nisanê da bîghêje "Şevêñ KOMKAR" ê yên ku wê li vir bêñ çêkirin.

Bî Silavêñ Şoreşgeri

C. Xebat

Yuwnan

## JI BO KOVARA "ROJA NÛ"

Em beri hemû tiştan silavêñ xwe yên germin û şoreşgeri pêşkêsi we hevalêñ hêja dîkin.

Daxwaza me xebat û pêşketina kovara roja Nû ye.

Em hemû dizanın ku iro we bi rasti bareki giranbihâ daye ser milêñ xwe. Lê belê ev kareki bi hêsan nine. Wexta Roja Nû ghişte destê me em gelek kîfxwes û dilşad bûn. Dî rewşa iroyin da dijmîn, gel û niştiman-nê me bi dirîndeyi û hoviti dişêline. Ew naxwazin em hebin û dî nav ji-yanake azad da serbest bijin, her wisan ji hemû şoreşvan û niştiman-perwerên Kurd pêwiste hevkariya kovara Roja Nû bikin, dest bîdin hev wek kulmekê pêşta herin.

Tenê em bi vi cureyi dîkarin ronahiya li ser gelê xwe biparêzin. Napol-yon rast gotiye: "Ez ji hezar tang û hezar leşkeran natırsim, lê gotareke rojnaman mîn ditîrsine."

Ez hêvidarım, her wext Roja Nû bîghêje destê me, em pê ronahiya Roja Nû gulên çanda xwe av bîdin, mezîn û geşîr bikin.

Mîrin û neman ji bo hemû dijmînêñ gelêñ bîdest.

Newroz

Şerkareki Riya Azadi Ji  
Kurdistana Iranê

## HEVALÊN HÊJA

Pîsti gelek silavan, ez şadiya we hemûyan dixwazin. Bîrayêñ berêz, xeber hate Kurdistanê weki zanayê mezîn Qanadê Kurdo çûye ser heqîya xwe.

Ez ji ber vi derdê giran we hemû hevalan

ra serxweşiyê dixwazim. Ez li gel we hemû hevalan û malbata wi xwe hevderd dizanım. Bê guman Qanadê Kurdo, Cigerxwin û Yilmaz Guney nemîrine û namîrin ji.

Ahmet ŞERİFİ  
Kurdistana Iran

# CİVİN JI BO BİRANINA ŞEHİDÊN KURDISTAN



Roja 30.3.1986'an da Komela Karkerên Kurdistan Lı Swêd (KOMKAR-Swêd) cîvînek bî navê "Biranina Şehidêن Kurdistanê" pêkani.

Dî vê cîvinê da Qadi Mihemed, Apê Selim, Metin Aksoy, Mustefa Çamlîbel, Yılmaz Demir û hevalên din hatin biranin. Diwarên salona cîvinê bî şîklêن hemi hevalan û bî ala me ya rengin va hatibû xemilandin. Cîvin ji aliyê koroya komelê bî merşâ netewi "Ey Raqip" va hate vekirin, piştî vê yekê serokê komelê bî axaftinekê va pêwistiya biranina şehidan ani ziman û bî deqek rawestandin Apê Selim tevi şehidêن din yên Kurdistanê hatin biranin. Piştî axaftına serokê komelê û rawestandinê, Sekreterê Giştî ya Partiya Sosyalist a Kurdistan'a Tîrkiyê (PSKT) hevrê Kemal BURKAY, axaftinek li ser biranina şehidan û pêwistiya kar û xebatêñ nav welat û dervayı welat ber çav kîr. Paşê hevalek li ser jiyan û tekoşina Qadi Mihemed deng kîr. Ü heualek dîn ji li ser jiyan û tekoşina Apê Selim dûr û dirêj deng kîr. Dî dawiyê da heualek bî awaki tevayı li ser jiyan û tekoşina şehidêن Kurdistanê yên wek Mustefa Çamlîbel, Metin Aksoy, Yılmaz Demir û hwd., ku çi bî destê hêzên tari û polêsan dî êşkenceya da hatine şehidkirin, deng kîr û dî navbera her axaftinekê da çend helbest hatin xwendin.

Dî dawiya cîvinê da merşâ "Ey Şehidan" hat xwendin û cîvin bî vi tehri xelas bû.

# **Hevrê APÊ SELİM Jiyana Xwe**

## **Bo Azadi û Sosyalizmê Da**

**ŞEMDİN**

Endamê Komita Merkezi yê Partiya Sosyalist a Kurdistanâ Tirkîyê(PSKT), hevrê Mistefa Budak beri du sala çû ser heqîya xwe. Lî, ew bî bir û baweriyên xwe va nemîr, ew bî ramanê xwe va iro rê nişani me dûde.

Mistefa Budak(Apê Selim), dî sala 1940'an da lî bajarê Dersimê jî diya xwe bûye. Dî nav wan salan da, ev hêla Kurdistanê hatîbû talankîrin, şewitandîn, jî van malên şewiti hêñ du jê hildikîsiyan, jî bûrinan xûn dîherîki dîçû.

Zaroktiya wi dî nav van lorîk û serpêhatiyan da derbaz dîbû. Ew zarokê gundiki belengaz bû, jî ber vê yekê ji, wi jiyanekî belengaz û perişan derbaz kîr. Dî her merhela jiyina xwe da wi, ev problem tîm û tîm lî pêşîya xwe dit. Rojekê lî gel hevalên xwe lî ser tuştan dîpeyivi, jî cixara xwe hulmeke kûr kışand û dest bî serboriyekê kîr: "Rojekê dî lisê da mamoste pirseke matematikê jî me pîrsi. Mîn bersiva wê zanîbû, lê jî ber ku şalê mîn dîriyabû, mîn fedî kîr. Mîn nexwest ku hevalên mîn lî ser mîn bikenin". Wi disa dîgot: "Ez jî diya xwe fîr bûm weki em Kurd'm. Jî ber ku diya mîn tîrki nîzanîbû. Vê yekê ez geleki fikirandîm. Salêñ hatî da ez xweş pê hesiyam ku

em ne tîrk in".

Hevrê Mistefa ciwaniya xwe da hertîm jî nîerinêñ çep ra vekiri bû. Ew hoy û mercêñ ew dî nav da mezîn bûbû û hin mercêñ der gihiştîna wi da bûbûn bingeh. Piştî guhîrandîna sala 1960 dî nav xwendekarêñ Tirkîyê da baweriyên çep lî lez belav dîbûn. Vê yekê lî ser wi ji tesir kîr. Dî wê demê Apê Selim dî Zanîngeha Enquerê da beşa Zîmanê Rûsi dîxwand.

Çawa tekoşîna Kurdistanâ Iraq, wusan ji ew meşînêñ (Xwepêşanêñ 1967) lî wê dewrê lî Kurdistanê çê dîbûn û hin faktorêñ dîn, lî ser welatparêzi û tekoşeriya wi tesireke mezîn nişan dan.

Dî dawiyê da wi lî bajarê Edenê mamosteti dîkir. Sala 1980, 21 Adarê gelê me û hevalbendêñ PSKT'yê tirêñ kolonyalistan kışandîn ser xwe. Dijmin bî hoviti êriş kîr. Gelek kesen bê guneh hatîn girtin. Hin kesan dest jî xebatê berda, pûç bûn. Hin kesan bîrinêñ kûr girtin. Gelek heval ketîne destê dijmin, jî wana Metin û Yılmaz jî ber lêdan û işkencêñ dijmin dî zindanê da hatîn kuştin. Dijmin bî xof û xwedi fîrsed bû.

Jî ber ku em bîrinêñ xwe bikewînin, nehêlin zêde xûnê wundakin, heval û dîlxwazê xwe jî êrişen dijmin bî-

parêzin, xwe paşvekîşandin, dî vê demê da pêwist bû.

Hevrê Mistefa, dî vê êrişa dijmin da hate aşkirekîrûm û hêzên zordest lê gerîyan. Mistefê dev jî karê xwe berda û kete nava xebata veşarti. Êdi ew Apê Selim bû.

Pışti ku 12 İlonê da cunta faşist a leşkeri hate ser hukîm, karên siyasi çetintir û gîringtir bû.

Dî wan rojêñ mij û duman da Apê Selim xebatek gîring hîldabû ser milê xwe. Lê ew bî camêri xebiti û gelek heval jî ber lepê faşizmê xilaskîrin. Ew bî neçari derbazi derwayî welat bûn.

Pışt ra ew jî, jî welatê xwe derket. Partiyê cara duwem bû ku lî Kurdistan'a Iranê da berpirsiyari dîda wi.

Ew lî Kurdistan'a Iranê nêziki du sala ma. Bî tevi hevalên xwe, jî gelê me yê şerkar ra piştgirtiyeke xurt nişan dan. Jî aliki da gule lî dijmin barandîn, jî aliyê dîn da bax û baxçe serastkîrin. Bî kurtayî kitêb, tifing û bêr bî hostati şuxulandin. Numuna kolhozekê pêk anin.

Lê pîr mixabin ku nexweşinek bê derman Apê Selim girt. Jî ber vê yekê hate Stockholmê. Çi çare ku tu riyeke xîlasbûnê jêra tune bû.

Apê Selim giraniya nexweşîya xwe dizanibû, lê disa jî bî xurti berxwe da. Yek gotimeke bê hêvi negot û tu caran xwe lî ber mirinê sist nekir. Ber mirinê da jî numuneke berxwedanê da xuyakîrin. Dî dawiyê bin ket. 30'ê meha Adarê rojêñ bîharê ku kulikê çiyan lî ber ba û baranê seri radikîrin, agirê newrozê şerê gelê me lî hember faşizmê germ dikir, Apê Selim jî nava

me barkir û çû dilovaniya xwe.

Apê Selim emîrki kîn, nivemîr jiya. Lê belê bî şîklîki bî rûmet û serbûlînd. Zarok û hevrêñ xwe ra mirateke baş hişt. Tîştê ku dîkeve ser me finda azadiyê zêtir pêşvabîrin e.

Apê Selim şertên dijwar da hatîbû pijandîn. Mêrxas, egit û serwext bû. Divê ew nava şer da, rojêñ xeter û teng da bîhata naskîrin.

Dî rojêñ teng da nebez bû, destê ku dîgirt bernedîda. Nedixwest ku jî eniyê qul vebîbe, hevalê bal wi paşa bîmine. Parti û pêşengiya wê ra baweriya wi xurt bû. Tu wext nehejiya, kesen westiyayı ra nebû heval. Merîv baş nasdikir, nedixapiya, fedekari û dilgermiya wi jî bo dostan bê sinor bû.

Jiyana wi gelek hêsa û sade bû, nêziki gel bû, tenê tiştîk kimet nedîdayê, ew jî pere û pul bû. Lî hember heval û zarokêñ xwe nefş piçûk û dilgerm bû. Lê lî hember dijmin bê tîrs û serhişk bû.

Militan bû, merîveki xebatê û tevgerê bû. Wi baweriya xwe bî sosyalizm ani bû. Jî bo Kurdistanê azad û sosyalist bêwestan xebiti, canê xwe jî di vê rî da da. Bî kurtayî ew şoreşgerekî numune bû.

Apê Selim tu gora xwe da rehet râzê. Hezaran Apê Selim wê lî pey te bimeşin. Şîk tune ku ewê welatê me azad kîn û şehidîn Kurdistanê tim û tim wê bir binin.

HEVRÊ MISTEFA BUDAK DI DIL

Û ŞERÊ ME DA WÊ BIJÎ....

# Çend Gotin Lı Ser Weşanên Periyodik

û

## Rola Kovara ROJA NÜ

Çawa tê zanin, dî roja 22.4.1898'an da Rojnama Kurdi ya pêşin "KURDISTAN" hate weşandin. Ev roja navdar dî nav Kurdan da wek "Cejna Rojnamavaniya Kurdi" tê pirozkirin. Ev lêgerina bî vê munasebetê va hatiye amadekirin.

ROJA NÜ

Paşi derketinâ rojnama Kurdi ya yekemin (Kurdistan 1898-Kahire) gelek rojname û kovarên Kurdi lı Kurdistanê û lı dervayi welat hatine çapkırınê. Jiyina hinekan dirêj ajotîye. Dr. Kemal Fuat dî sala 1972'an da hemû hejmarên vê rojnama Kurdi ya yekemin wek kolleksiyonekê ji nûh va weşandiye û ew gihandiye destê xwendevanan(1)

Lı ser diroka rojnamevaniya Kurdi heta niha çend xebatê zanisti ji aliyê ronakbirênen Kurd da hatine amadekirin, wek xebatê Maruf Xaznedar(2), Dr. Mustafa Resul (3), prof. Qanadê Kurdo(4). Bî destê van xebatan gelek mirovên me û gelê me lı ser van weşanen bî firehi agahdar bûne.

Lı ser rewşa weşanen periyodik lı Türkiye, dî sala 1981'an da A.A Guseynov xebateke fireh bî çaveki zanisti nivisi(5). Dema Guseynov lı ser rojnamevaniya Türkiye dînivise, wusan ji navê kovara Riya Azadi (Özgürlik Yolu) û Roja Welat dîde û lı ser wan dîsekine.

Tenê sala 1984'an da lı Leningradê ji aliyê sê xwendekarênu ku lı wir rojnamevaniyê dixwinnîn, sê xebatê zanisti li ser kovarên kurdi hatin amadekirin. Her xwendekareki bî çaveki zanisti ew analiz kirine, naveroka wan vekolandine û gîringiya kovar û rojnamen kurdi raxistîne meydanê. Ev hersê xebat ji aliyê Seyxo Abdula Mecit(6), Leman İbrahim(7), û H. Hebeş(8) da hatine nivisan-dînê. Ev hersê xebatê nûh ji nişani me dî-

dîn ku dî rewşa iro da her kovar û rojnameke kurdi dî her warê jiyinê da roleke bêhempa û bêbivan dîlizin.

Kovar û Rojnamen Kurdi dî jiyina xwe da zordesti, lêdan û êrişen mezîn ditîne. Jî ber vê yekê gelek caran hatine girtinê. Ew gelek caran bî dizi derketinê, an ji cihê çapê guhartine. Dî nav şerê germ û dî nav dengê top-tîvingan da jiyina xwe dane ajotinê û bûne per-baskê gel. Ev xusiyeta rojnamevaniya kurdi gelek gîringe. Tenê rojnama Riya Teze ya ku lı Sovyetê çap dibe, eva 56 sale bî serbesti û dî nav mercen aza da jiyina xwe dajo. Heta niha 3850 hejmarên vê rojnamê derketinê.

REWSA WEŞANEN PERYODİK LI EWRÜPÊ:

Iro rewşa kovar û rojnamen Kurdi lı Ewrüpê çîne?, ew dî çî rewşê da ne?, pirs û problemen wan çîne? ew dîghêjine destê çend xwendevanan? dî warê şêwe(tehr) û naverokê da gîringiya wan çîye? tesira kesen nerojnamevan lı ser van weşanen çîne, kadroyen niviskar dî vi warî da çî rolan dîlizin, wek van pirsan ser gelek pirsên mayin, heta niha ne civinek, ne nivisarek û ne ji beyanek derketiye. Herkes dî tanga xwe da dicidîne weki tişteki çap bike û lê xweyi derkeve. Dî warê bîlîndbûn û geşbûna tekoşina rîzgariya neteweki da nêzikbûn, yekiti û pevguhastina baweriyan, dî her warê jiyinê da nejo, ew netew zû-zû nikare xwe ji belavbûnê xîlaske.

Ev çend sale bî taybeti li Ewrûpê li ser çand, huner, edebiyat û jiyana politik gelek kovar û rojnamên kurdi têñ weşandin. İro ev weşanêñ bî demi(periyodik) dî warê pêşketina Çanda Kurdi da roleke giring, bêhem-pa dilizin. Dî navbera gelek rêxistin û xwendevanan da ev weşanêñ periyodik bend û pêwendiyêñ jindar pêk tinin, dan û standinêñ pirali dî navbera xwendevanan û van rêxistinan da peyda dibin. Bî saya wan weşanen pevguhastina baweriyêñ nû, danasina efrandin û nivisarêñ nû bî lez, dî nav demekê da dighêjine destê xwendevanan. Ev yeka iro dema em van weşanêñ periyodik dinêrin teñê ji bo hin weşanen derbaz dibe.

Hin kovar û rojnamên kurdi hene carina bî periyodik dernakevin. Misal kovareke pêwiste mehê carekê derkeve, tu lê dinêri 4 meh şunda derdikeve û 4 hejmar bî hevra derdikevin bo vê yekê ji pêwendiyêñ navbera xwendevan û van rêxistinan da qels, xizan û pûç dibin. Sedemên vê yekê pîrin, wek tunebûna imkanêñ abori, kembûna kadroyêñ rojnamevan, qelsbûna pêwendiyân, jarbûna hin rêxistinan, wusan ji cihê van weşanen hin weşanêñ nûh têñ weşandin, nav têñ guhartin. Misal paşı sala 1975'an ev weşanêñ kurdi bî wan navan va careke din nehatine weşandin. Pale, Ronahi, Azadi, Rizgariya, Kurdistan, Riya Rast....

İro dema em weşanêñ periyodik raçav dikin, em dibinin ku nêzkaya bist weşanêñ periyodik li Ewrûpê çap dibin. Ev weşanêñ periyodik carina bî du ziman (wek kurdi-türki) weşanêñ bî du ziman têñ weşandin. Hînek carina bî çend zaravayêñ kurdi nivisaran diweşinin. Hînek bî wêne-sûret derdikevin, hînek bê wêne-sûret çap dibin. Hînek ji vana niv çandi û niv politik in, hînek ji seranser li ser pîsekê naverokê xwe pêk tinin. Wek van xîsusiyetan, gelek xîsusiyetên mayin ji mirov dikare rêz bike. Lî tiştek ji bo hemûyan yekê, ew ji, navê van hemû weşanen bî Kurdi ne. Wek Riya Azadi, Dengê Komkar, Roja Nû, Armanc, Niştîman, Kulilk, Hêlin, Hêvi, Tekoşer, Berbang, Pale, Yekiti, Dengê Yekitiyê, Mirkut, Mamosteyê Kurdi, İsot, Muzik û Huner, Mizgin. Wek Svensk-Kurdisk Journal hin kovar û bulten ji bî zimanî bîyani têñ weşandin.

Weşanêñ periyodik dî bilînbûna tekoşina netewi da bî rasti roleke gelek mezîn dili-zin, li diji hêzêñ neyar çekeke bî xurt pêk tinin û paşê dibin malê gel, dibin definekê dî nav diroka çanda welateki da.

Sala 1985'an li Swêdê sê weşanêñ Kurdi yên kevn Jin (1918-1919), Ronahi (1942-1945) û Roja Nû (1943-1946) wek kolleksiyonan ji nûh va gihiştin destê xwendevanêñ Kurd. Bî çapbûna wan hersê efrandinan va mirov têdighê weki weşanêñ periyodik ney-nikeke çand û jiyina netewekine.

Li Swêdê sala 1985'an da serhev sê kovarêñ pêkeniyê (Zengil, İsot, Mirkut) kurdi çap bûn. Jî bo tijikirina vê valahiyê bî rasti gelê me hewcedari van weşanaye. Lî van hersê kovaran hêzêñ xwe bikirina yek, nave-roka xwe xurt û tiji bikira, wê hin ji gelek baş bûbûya. Her weşaneke periyodik beri derketina xwe pêwiste, imkanêñ xwe, xwendevanêñ xwe û xweşbûna weşanê carke din berçav bike.

Hin kovar û rojnameyêñ Kurdi yên ku iro li Ewrûpê derdikevin, dî warê şêwe (tehr) da bî gelek këmasi, şâsi û xeletiyân va tijine. Carina kovarek an ji rojnamekê dîdi ber çavan, dî warê rastnîvisandinê da, dî warê mîzanpajê (raxistina nivisaran û ciwarkirina wan) da, an ji dî warê şîkl û sûretan da, hilbijartina wan da gelek këmasi çê dibin û diciñ dighêjine destê xwendevanan. Kovarek an ji rojnamek bî naveroka xwe va çiqas têr û tiji be ji, wek bî xeletiyêñ şêweyi va derketin ji derneketina wan hin ji çêtire.

Carina hin nivisar bî maşinê va têñ nivisandin, lê bî destan va, bî pênuşan va têñ serrastkirin, eva tişteki gelek ecêbe. An ji ew gotinêñ şâş hatine nivisandin, mezinayı û piçukiya tipan, an ji stilên tipan nadîn ber çavan, bî hin tipêñ din va têñ serrastkirin, ev ji xeletike mezine.

Gelek caran kulikêñ tipan wek(é)nayê dandin, gelek caran misal Qanad dibe Oanat, wek van xeletiyêñ serrastkirinê gelek xeletiyêñ mayin ji dî nivisaran da têñ xuyan.

Kovar û rojnameyêñ Kurdi pêwiste êdi xwe ji van şâsi û xeletiyân biparêzin. Misal carina sûret, wêne çap dibin, dî bin wan da tiştek nayê nivisandin, ew wêne an ji sûret dibe jêderxistinok.

İro dema em gelek kovar û rojnamêñ Kurdi raçav dikin, em dibinin ku carina xeleti, şâsi û çewtiyêñ gramatiki dî nav tekstan da peyda dibin. Jî aliki da cihnegirtina hin pîsîn rastnîvisandina zimanê Kurdi, ji aliyê din da nezanebûna hin qaydêñ zimin dibin sedemên van şâsiyan. Em li jêr li ser van çend pîrsan dîsekînin.

1. Dı kurdi da hın nav hene jı rengderan û jı navan, an jı, jı navan û jı lêkeran pêk hatine, dı kurdi da ev misalan pırın. Wek bilindbûna tekoşina me dijmin ditırsine. Hın kes carna bı teheri xelet dînivisin wek bilind bûna tekoşina me dijmin ditırsine. Dema kesek peyva "Bilindbûn" è dı dı ferhengekê da bigere, ewê bibine wek ev herdu peyv (bilind—bûn) bı hevra tên nivisandin û naveke, misaleki din, jı ber hevduditina me ez gelek kêfxweş bûm. Lı vira hevduditin jı du peyva pêk hatiye û wek naveki tê hesibandin, pêwiste bı hevra bê nivisandin.

2. Dema hin fêlên (lêker, verb) dı dema berê—buhi da tênen xebitandin, hın kes vê fêlê jı hev cuda dikin, bı fêla "Bûn" va tevlihev dikin. Misal "Kê Mem û Zin nivisandi ye?", Pêwiste li vira hevra bê nivisandin wek, Kê Mem û Zin nivisandiye?. Dema mirov fêla büyinê dide xebitandin, mirov "ye" cuda dikare binivise, wek "Ev Se (küçük) ye". Lı lı jorê peyva nivisandiye bı serê xwe formeke. Jı ber ku nêziki hevin, hın kes van herdu tişta tevlihev dikin.

3. Dema mirov dı zimanê kurdi da hın navan ditewine wan dı hevokan da dide xebitandin, orijinalê van navan diguhêrin, wek şivan dibe şivin (Şivin got), aş dibe eş (Ez çümê eş), ki dibe kê (kê got) ... Bı taybeti gelek kes peyvén "kê" û "ki" tevlihev dikin. Wek "Ki got?" eva şase, pêwiste bê nivisandin "Kê got?". Cihê bı karanina "ki" cuda ye, wek "Te ki dit?"

4. Jı bo pêkanina formen negatif yêfêlan, bı taybeti "ne", "na" tê bikaranin, wek ez na-xwazim, ez neçûm. Tenê qaydeki cuda heye, ew ji bikaranina lêkeren "zanin", û "Karin" e. Ev qayidê jorin wek "na", "ne" jı bo van herdu lêkeran derbaz nabın. Rastiya wan wek lı jér tê nivisandin, bı alikariya pêşpirтика "ni", wek ez nizanım, ez nikarım, mirov nikare bêje, ez nezanım, ez nekarım, evana xeletin.

5. Xeletiyê mezin carna dı warê hevgirêda-na gelek navan da (izafet) peyda dibin.

Wek "...em benda çirok û wêne yêne wene" eva şas e, pêwiste bê nivisandin "...em benda çirok û wêneyêne we ne". Eger naveki din jı lı ser vê hevokê da zêde bibe, vê carê mirov dikare "yêne", cuda binivise, wek "...em benda çirok û wêneyêne we yêne xweşik in". Pêwiste mirov van qayidênen jérin bide ber çavan:

Destê min yê cepê (Cinsê nêr Dest)	
Mala min ya mezin	(Cinsê mê dar)
Cavên te yêne reş	(yêne, formen pirani)
jı bo herdu cinsan	

6. Zimanê kurdi, da, dema mirov lêkeran (verb) dıkşine, jı bo dema niha û dema wêbê (futur) tehrênen negatif jı bo van herdu deman wek hevin. Misal em lêkera listin binin ber çavê xwe. Dema niha, ez dilizim, dema wêbê; ezê bilizim, teheren negatif vê carê wek hev tên nivisandin misal, ez (iro) nalizim û ez (sibê) nalizim. Hın kes dibêjin wusan nabın. Tenê ev forma, dı hin kilam û stranan da wek stileke edebi dikare bê bikaranin, misal

"Ezê nadim guliyê zêrin  
Bı hezaran, bı milyonan"

7. Şaşiyek mezin dı warê tevlihevkirine cinsê navan da peyda dibe. Navên bı cinsê nêr (maskulin) û cinsê mê(feminin) gelek caran bı xeleti tên bikaranin. Dı zimanê Kurdi da, bı taybeti dı zaravê kurmancı da eva yeka gelek giring e. Lı vir pêwiste mirov hın qaydeyên grama-tiki bide ber çavan, misal;

destê min —desteki min(Cinsê nêr)  
Mala min —maleke min (Cinsê mê)

Angori van misalan, em peyva Kurdistan bîdîn ber çavan, ev peyva peyvek feminin e. Jı ber ku em dibêjin Kurdistan azad (lı vira tipa a nişan dide ku ev peyva feminin e). Angori vi qeydeyi jı bo formen ne-diyar, pêwiste bê nivisandin Kurdistanek azad, lê gelek caran ev peyva wek naveki lı ser cinsê nêr tê nivisandin û bı xeleti dibe "Kurdistaneki Azad".

8. Nav dema dı hevokê da wek obje an ji subje tê bikananin, teheren wan cuda dîbin Misal "...Bavê Nazê Panelê idare kır. (Panel lı vê hevokê da obje ye, pêwiste bê nivisandin; ...Bavê Nazê panel idare kır) Peyva panelê tenê dema subje, wê çaxê tê bikaranin, misal; ...Panelê deh rojan ajot.

Şaşiyek din jı dı warê tevlihevkirine hın ci-navan da peyda dibe, misal,

—Ew guh dîdan zimanê Ewrûpi (Rastiya wê; Wan guh dîda zimanê Ewrûpi)

—Celadet Bedirxan û Qanadê Kurdo lı derê welat vi işi meşandiye (Rastiya wê; ...ev işa meşandive)

—Qanad tişteki nû derxistiye, lê Celadet wê neditiye (Rastiya wê; ...lê Celadet ew neditiye). Ev misalênen jorin jı hejmara kovara Berbangê ya 9'an hatine wergirtin. (9)

9. Hın kes car-caran formen lêkeran yêne formen wêbê(futur) bı xeleti bikartinin. Misal, ezê

bînivisim bî xeleti tê bikaranin, wek ezê (dê) bînivisim, ezê(wê) bînivisim. Formê wê (dê) pêwist nine li vir bê bikaranin, jî ber ku dema an dibêjin "Ezê bînivisim" bî xwe dî nav peyva Ezê (ez- ê) da, tipa ê nişana dema wêbê ye. Tenê forma wê an ji dê, dî nav hin pêwendiyê mayin da têbikaranin, misalek, dema em dipırsın "Hesenê Sibê bê Cîvinê?", bersiv "wê bê"

10. Dema nav wek Sernîvisar (Serlevha,Başlık) têbikaranin jî bo formê pirani (pirhejmar) nav pêwist ninin paşpirtika-an bistin. Hin kes

bî turki an ji bî zimaneki din difikirin angori van zimanen hin formen nuh dî zaravê Kurmanci da peyda dikin. Em bifikirin pirtûkeke nûh bî turki derketiye navê wê "Arkadaşlar" e, mirov nikare navê vê pirtûkê bî kurdi dayne "Hevalan" eva şas e, navê pirtûkê mirov tenê pêwiste bînivise "Heval". Disa forma pirani dî hin hevokên din da ji bî xeleti carna tê bî karanin. Wek "mîn Hevalan ditin", rastiya wê "mîn Heval ditin". Dî nav lêkera "ditin" da diyare ku ew gelek kes in.

## LI SER ROLA KOVARA ROJA NÛ

Çawa tê zanin Roja Nû li Swêdê piştî sala 1983'an destpêkir wek kovareke çandi, huneri û edebi bê çapkirin. Dî nav van sê salan da donzdeh hejmarêne wê derketin. Roja Nû dî nav sê salan da li çar aliye cihanê, li gelek welatan hat belavkirin û hat xwendin. Dî nav van sê salan da jî aliye xwendevanan da gelek rexneyêna baş, cihda û ne cihda grihiştin redaksiyonâ kovara Roja Nû. Kovara Roja Nû heta dest jê hat hemû ev rexneyan da ber çavê xwe û jiyina xwe heta iro ajot.

Dema Roja Nû destpêkir wek kovareke çandi, huneri û edebi derkeve, hin kesen ne alivan, bî serê xwe, jî siyasete dûr, gotin weki Roja Nû bî destê rêxistîneke siyasi da, dî bin siya wê da derdikeve. Ev kesen jî politikayê vedicinîqin, jê ditîrsin an ji jê hez nakin an ji dî bin tîrsa perwerdegariya burjuvaziya Türk da mane, hertim dixwazin wan karê çandi, huneri û edebi jî politikayê cuda bikin. Çand huner û edebiyateke bî serê xwe va mijûl bîbin. Ev yeka ne raste, hêzên kolonyalist, zordestiyê ser gelê me pêk anine, bî politikaya şoven, nijadperest va karênen xwe dajon. Lî diji van zordestiyan, rêxistînen politik yên Kurd hertim dî nav şerda tekoşin didin. Ev yeka tişteki başe an ne başe, bersiva vê pîrsa gelek caran ev ronakbirêne bê seri-bini nikarin bîdin. Bona vê yekê jî Roja Nû karênen politik û karênen çandi, huneri gihadine hev, wek çekeke tekoşinê jî xwe ra hilbijartiyê û jî politikayê jî hez dike. Lî diji politikaya kolonyalistan politika me jî pêwiste hebe, rêxistînen me yên politik jî pêwiste hebin. Maksim Gorki, Konstantin Simonov, Şolohov endamê kijan partiyê bûn, jî bo çi çubûne şer, çi karê wan hebû li wira, wan li diji kî şer dikir. Pêwiste bersivê van pîrsan bîn dayin.

Dî nav van sê salan da kovara Roja Nû bî baweriya me karênen hêja, dî warê danasina çand huner û edebiyeta Kurdi da pêk ani. Lî ser hin pîrsen heta niha tiştek zêde nehatiye nîvisandin, Roja Nû gelik nîvisarêne zanisti pêşkêsi xwendevanen xwe kiriye.

Jî aliye din, dî her hejmareke Roja Nû da bî keseki nav û deng va hevpeyvinek hattîye çekirin. Jî aliki da xwendevanen Kurd li ser jiyan û xebatêne van kesan agadar bûne, jî aliye din da bî pîrs-bersiv xwendevanen me mecal ditine weki baweri û ramânen wan li ser gelek babeta, fîr bîbin, wek, Dr. Kemal Fuat, prof. Heciyê Cindi, Michael Hemphrey, M. Emin Bozarslan, Prof. Lazarev, Prof. Farizov, Kemal Burkay, Eliyê Evdilrehman hatine çekirin.

Kovara Roja Nû dî her hejmareke Kurdi da rûpelek cih daye efrandinêne li ser Kurdan, ev efrandin jî xwendevanan ra daye nasin. Heta niha nêzikaya 60-70 efrandin dî nav rûpela "Weşanen Nû" hatine danasin.

Dî nav rûpelene Roja Nû da, dî nav sê salan da gelek nimûnen folklora me hatine weşandin, wek stran, çirok, benden pêşian, destan, serpêhati û pêkeni...

Roja Nû hertim cedandiye weki li ser çand, huner û edebiyata Kurdi nûçeyen teze bîghine xwendevanan. Bî sedan nûçeyen hêja dî kovare da hatine weşandin. Jî aliki da kovara berpîrsiyariyêne rojnameke per-yodik hildaye ser milen xwe, xwendevanen me bî lez û germi-germi mecal ditine weki van nûçan bixwinin.

Dî pûpelê pêşin da Roja Nû cih daye dengê xwendevanan û namen wan dî van rûpelan da hatine weşandin.

Gelek belge û dokumentên diroki bî destê Roja Nû hatine weşandin.

Disa dî warê edebiyata Kurd da heta niha bî sedan helbest, serpêhati, rexne û nivisarêن mayin, jî aliyê niviskarêن lî dora Roja Nû da, hatine weşandin. Jî bo pêşketîna edebiyata Kurd Roja Nû gundarike mezîn daye lî ser vê pirsê. Bî taybeti nîşâ nûh, niviskarêن nûh gihiştî, dî nav rûpelêن Roja Nû da efirandinêن xwe weşandine û ew gîhandine destê xwendevanêن dîn.

Piştî Şoreşa Oktober (1917) eva nêzika ya 70 saliye çanda Kurdi li Yekitiya Sovyet dî nav merc û hoyêن serbest û azada pêşda dice, heta niha dî vi wari da bî sedan xebat, efirandinêن berketi amade bûne, wek Leningrad, Moskova, Erivan, Bakû, Tibilis gelek navçeyên kurdzaniyê (Kurdoloji) li Yekitiya Sovyet peyda bûne. Bî navê van xebatan rûmet û serbilindiya Kurdzaniyê gelek navdar bûye. Bî sedan zimanzan, dirokzan rojnamevan, niviskar, hunermend, listikvan, û pîsporêن çanda Kurdi gihiştine, bûne malê gel, wek; Sukerman, Zera Usîv Qanadê Kurdo, Ereb Şemo, Heciyê Cendi, Eminê Evdal, Çerkez Bakaev, Ordixan, Celilê Celil û gelek kesen mayêن, Kovara Roja Nû jî bo danasina vê çanda Kurdi li Yekitiya Sovyet, hertim dî nav rûpelêن xwe da cih daye van xebatan. Eva yeka tişteki kérhati sudmend û raste ji. Jî ber ku çanda kurdi bî çaveki zanisti tu cîheki ewqas baş nehatiye vekolandin, wek Yekitiya Sovyet.

Roja Nû jî aliyê din da guhdarike mezin daye ser hilbijartina wêne, suret û nigarêن orjinal, jî bo paqîş derketina wan Roja Nû hertim cedandiye weki orjinalita wan bîparêze. Bî taybeti rûpelêن pêşin û dawi da gelek wêne û suretên xweşik û bedew hatine çapkırınê. Pîrsa mizanpajê, raxistina nivisaran di nav rûpelan da, jî bo me bûye pîrseke sereke.

Dî warê zimin da, Roja Nû hertim zimaneki sıvik, nerm paqîj û zelal bî kar anije. Hin peyv, gotin û xeberên nûh, jî ber xwe dernexistiye û ew pêşkêşî xwendevanan nekiriye. Jî ber ku ziman haceteke dan û standinê ye, pêwiste zelal be. Iro dema em li hin kovarêن kurdi dînhêrin, ew kesana dixwazin weki sedi-sed zimaneki paqîj peyda bikin. Lê gelek mixabin, zimaneki wusan lî cihanê qet tuneye. Iro em tenê wek misal zimanê İnglizi binin ber ca-

vêن xwe, vi zimanî bî hezaran peyv tenê jî zimanê Frensi girtiye, xistiye nav defina peyv vêن xwe.

Iro li ser elifbaya Kurdi, bî taybeti dî nîvisandina zaravê Kurmanci da hin raberzinêن ne cih da têن çêkirin. Ev kesana li ser du-sê tişteken piçük, guhartina nîvisandina hin tipan an jî hin paşpirtikan diqîrin, diqîjin û dibêjin "Rehmeti Celadet û Kamuran Bedirxan himê vê elifbayê danine, ew carke din çawa dibe bê guhirandinê, ev nabe" dibêjin. Pîrs, pîrsa Kamuran Bedirxan an ji Qanadê Kurdo nine. Pîrs pîrsa hêsakırına Elifbaya Kurdiye û eva ji tişteki normale. Çîma li şûna tipêن "Î û Î", "Î û Î" tê nîvisandin, an jî li şûna paşpirtikêن "re, de, ve", "ra, da, va" tê nîvisandin, an jî ew çîma bî hev va, an jî cuda tên nîvisandin. Dil dixwaze ev kîmasiyêن piçük jî ortê rabin, ev raberzinan jî bîqedin. Lê mixabin dî rewşa iro da ev çend cudatiyêن piçük hin ji hebûna xwe diparêzin. Sibê an ji dusêbe ev dijwariyêن çawa jî ortê rabin, dorê bê vê yekê ji. Iro hin dewlet hene ev sedsale zaninge-hêن wan hene, zimanzanêن wan hene, televizyonêن wan hene, bî milyonan perê wan hene, disa ji carma lê dînhêri guhartinêni piçük dî zimanê xwe da çê dikin, eva yeka tişteki normale.

Iro gelek kes dibêjin weki zimanê Kurdi zimaneki İndo-Ewrûpiye, wê çaxê pêwiste zimanê Kurdi wek usulêن van zimanâ bêñ nîvisandin. Raste zimanê kurdi zimaneki İndo-Ewrûpiye, lê hin kes disa jî bir dikin weki dî nav zimanêni İndo-Ewrûpi da gelek ziman hene, her zimanek ji jî aliki da jî zimanê din cuda dibe. Gelek karekterêن wan yên xweri hene. Rûsi zimaneki İndo-Ewrûpiye bî tipêñ kirili va tê nîvisandin, ne bî tipêñ latinî va. Misaleki dîn, Elmani zimaneki İndo-Ewrûpiye, hemû nav bî tipêñ mezin va pewistin destpêkin. Lê dî zimanê Kurdi, gelek zimanêni mayin da qayideki wusan tuneye. İspanyoli zimaneki İndo-Ewrûpiye. Dî vi zimanida ber hevokêن pîrsdariyê û paşı wan ji pêwiste nişanêni pîrsdariyê bêñ nîvisandin. Pêwiste zimanê Kurdi ji wusan be, na qayideki wusan tuneye, her zimaneki İndo-Ewrûpi çawa jî aliki da nêziki hevin, jî hin alian da jî, jî hev cuda dîbin. Dî vi wari da pêwiste mirrov hebûna zimanê Kurdi cara pêşin bide ber çavê xwe û analiz biki. Ne li pêşiyê zimaneki İndo-Ewrûpi analiz biki, zimanê Kurdi ji angori van ziman analiz biki. Vê çaxê em jî bin şaşı û xeletiyan nikarin der-

kevin. Pewiste mirov raste-rast ser tiştan da nemeşe, pêwiste mirov van tiştan geleki baş nas bîke û serhişk nebe.

Em naxwazin zêde li ser van pirsên şewe yi bisekinin. Lê hin mirovên me hene, dema kovar û rojnameke kurdi didine destê xwe, rexneyên xwe bî kulikên xwe, an ji bî "prepozisyon" ên xwe va sinor dikin. Ne navero ka wê, ne pêwendiyêne wê li gel xwendeva-

nan, ne ji li ser gîringiya nîvisaran dîsekînin û bî rexneyêne erzan va mijûl dîbin. Paşê ev kesana dîqîrim û dibêjin "wey Roja Nû, Armanc an ji M. E. Bozarslan, bî elifbaya ku rehmeti Bedrخanan daniye, bî wê va dili-zin". Ev gili-gotinan, iro li ser lêvên kesen xwe zane ji dihesibinin tê-dice, wek beniştan tê cütin.

## ÇAVKANIYÊN KÊRHATI

1. *Kurdistan, The First Kurdisch New-spaper 1898—1902, Collected and In-roduced by Dr. Kemal Fuat, Bagdat 1972.*

2. *Oçerk İstoriya Sovremnoy Kurdskoy Litteratur, Maruf Kaznedar, Moskova 1967*

3. *Li ser rojname û kovarén kurdi Dr. Mustafa Resul 1973, Bagdat*

4. *Tarixa Edebiyata Kurdi, Cilt 1—2, Qanadê Kurdo, Stockholm 1984—1985*

5. *Siredsva Massovoy İnformatiya v ob-şestvona Polticeskoy Jizni Tursiya, A. A Guseynov, Moskova 1981 (Di nav Jiyina Civaki û Politik Li Tirkîyê Da Rewşa Ha-ceten Geleri Yen İnformasiyonê)*

6. *Rola Jurnal "Dange KOMKAR" Revolitsionna Osvoboditelinom Divijeniye Kurdistan, Şeyxo Abdullah Mecid, Leningrad 1984*

"Rola Rojnama Dengê KOMKAR Di Soreşa Tevgera Hışyarbûna Kurdistanê Da,"

7. *Jenşini Kurdistan Na Stranix Kur-dskoy Periyodiceskoy Peçati, Leman İbra-him, Leningrad 1984 (Cihê Jinê Kurdistanê Di Nav Rûpelên Weşanên Peryodik Yen Kurdi Da.)*

8. *Di nav Diroka Edebiyata Kurdi Da Rola Kovara Hewarê, H. Hebeş, 1984*

9. *Panelek li Ser Wêye û Ziman, Berbang Hejmar 9—1985*

## SEMINEREK LI SER

### ROJNAMEVANIYA KURDİ

(JI 1908 HETA 1980)




Lî derbaray "Cejna Rojnamevaniya Kurdistanê" di roja 22.4.1986'an da li Stockholmê seminerek hate amadekirin. Çawa tê zanin di vê rojê da rojnama Kurdi ya yekemin bî navê "KURDISTAN" li Kahire sala 1898'an da hatiye weşandin.

Di cîvinê da nêzkaya 60 kesi besdar bûn. Babeta seminerê "Rojnamegeriya Kurd li Kurdistanâ Tirkîyê (1908 - 1980)" bû. Seminer ji aliyê Malmisanij da hatibû amadekirin.

# Azadixwazêن Cihanê

## Binyamin Moloise Jı Bir Nakın



A.ŞARWÊRAN

" Wê rojek reşik sazumana gel hili-nine destê xwe. Ew şerkerên ku jiyan-nê xwe windakîrin, jı bo azadiyê şe-hit bûn. Şer bê qeyd û merc gerek bê domandin.

Sedem ku van gotinêñ jorin jı ciha-nê ra bîdime sekîrîn kurê mîn wezife da mîn." Mamelika Moloise(Dayika B. Moloise)

Xelatê reşîka, Afrika Başur, ciyê zî-lîm, teda û zordariyê. Însanêñ wan yêñ têkoşer; çi kal, çi xort, çi jîn, çi mîr. Bî her rengê têkoşînê bî salan li ber xwe dîdin.

Şerkerê azadiyê yê Başûra Afrika, helbestvanê reş yê bî nav û deng, Bin-

yamin Moloisê beri ku jı aliyê rejîma nijadparêz va nahatîbû dardakîrin wan gotinêñ xwe yê jorin jı diya xwe ra gotibû. Diya wi jı gotinêñ Moloisê jı cihanê ra da sehkîrin.

Disa B. Moloisê di helbesta xwe ya dawi da weha dîbêje:

" Dî bagera zîlmê da  
Baranêñ mîn yê jı xwinê dê bîdo-mîn  
Ez jı jiyana xwe bî serfirazi xatîra  
dixwazîm".

Tenê ev gotin û helbestêñ dawi yêñ Moloisê ramanêñ wi û rewşa reşîka rînd tîne ber çavê merîv. Ev ramanêñ hêja dîbîne remza tekoşêriyê jı meri-vêñ birewer ra.

Binyamin Moloisê ne tenê helbestvan bû, wusan ji şerkareki azadiyê yê bê hempa bû. Ewi jiyana xwe fedakırıbû ji bo gelê xwe. Tu car lı ber dijmîn serê xwe xwar nekîr. Bî moralêkê bilind û serfiraz çû heqîya xwe. Sedem ev e ku navê wi lı ser lêvên milyona ye.

Çı kırıbû, çira hate dardakırın Moloisê? Ew dî sala 1982 da bî şika kuştina polêseki hate gurtın. Mehkema nijadparêz idda kîr ku Moloisê ji bo ewdhîlaninê polês kuştîye. Ew polêsê ku hatîbû kuştın bî xwe reşik bû û bî şahidiya wi sê endamên ANC'yê hatibûne dardakırın. Lê Binyamin ditinên mehkemê redkîr. Belge û delilan ji ditîna Moloisê dîda rastkîrîn. Herçend rasti ev bû ji, Moloisê dî çevê rejîma dagırker da bî cirim bû.

Binyamin Moloisê militaneki bê hempa yê ANC bû. ANC bî salan vîrda lı Başûra Afrika, ji bo azadiya reşîka bî tekoşeri şerdîke. Dî dawiyêda nijad parêza dî sala 1983'an da dî meha heziranê da bîryara dardakırına Moloisê dan.

Ev bîryara bê delil, ji aliyê hêzên cihanê yêni mirovi û demoqrat va bî dengêñ bilind hatîne protestokîrîn. Ji çaraliyêñ cihanê dengêñ protestoyan bilindbûn. Pîşti vana Konseye ya Parêzgeri (gûvenlik kon.) ya Yekitiya Koma Milletan dî 13 Çileyê paşin 1984 da bîryarêkê giranbuha stand. Ji rejîma nijadparêz bî dengêñ tevayî pêşniyar kîr û xwest; ku cîrmê dardakîrînê ji ser Moloisê rabe. Lê rejîma xwinxwar ya Başûra Afrika bî bê şermi go; evê ku kuştîye û evê ku hatîye kuştın her du ji reşik in, sedem vi ji ev bûyer ne bûyerêke nijadiye.

Lê eşkereye ku ewê kuştî reşik be ji poliseki dî xîzmîta sazumana nijadparêzda bû. Cîrmê Moloisê yê mezîn ji ew bû ku lı diji vê rejîma nemirovi serinizim nedîkîr. Cinayet lı ser Moloisê nehatîbû ispatkîrîn, lê sazumana Buta ya lı diji jiyanê qurbanêkê nuh dixwest.

Bî deng bilindkîrîna hêzên mirovi, yêni cihanê Buta dardakîrîna Moloisê heyâ meha tebaxê ya 1985'a texirkîr. Pîşti ku xuya bu idi dê Moloisê bê dardakîrîn, lı Başûra Afrika bî xwe-pênişandîna ci lı ser ciyan leyizîn. Rejîma nijadperêz dî van xwe-pênişandînê ji bo xîlasbûna helbestvanê mezîn, lı bajêrê Cape-Town'ê da du xort û zarakîki deh sali qetîlkîr.

Rejîma Buta ji bo ku otorita xwe bide nişandan, guh lı hêzên cihanê girt. Binyamin Moloisê bê guneh hat dardakîrîn.

Beri dardakîrîna wi bî çend seet diya wi mecal dit ku lı gel qisebîke. Diya Moloisê Mameliye Paukine Moloisê lı ser vê ditîna dawîn weha qise dîke: "Kurê min bo ku ez negrim dev ji pêsiра min berneda. Seetêñ xwe yêñ dawîn bî sitranêñ azadiyê derbazkîr. Go heyâ em azadbîbin dê têkoşin bîdome." Ev dayika bî rûmet gotinêñ xwe weha temam dîke; "Sedem ku ez xwedi ewladeki weha me û min jê ra dayiki kûriye ez gelek bextiyarîm."

Jî dardakîrînê ra şevek mabû. Tim girtiyêñ zindana Pretorya heyâ sibê ranezan û ji bo Moloisê kilam gotin. Dî berbanga sibê da gava helbestvanê ciwan derdikeve ser sepha dardakîrîne kilam ji nişkava têne seknandin. Lî derveyê diwarê zîndanê diya Moloisê û hevalêñ wi yêni şerkeren azadiyê

bendewarbûn. Gava xebera dardakırı-nê lî derve hate sehkîrîn kulgûn wana yêş şîdyayî rabûn hewa. Û merşâ reşîka bî yek dil û deng çaralî girt.

Piştî dardakırınê bergewanê (Avukat) Moloisê go; " Dardakırın roja 18 Oktoper 1985 seet dî heftada pêkhat. Û gotinê xwe wuha domand; " Binyamin Moloisê beri ku here mîrinê bangê hemû cihanê kîr û go bo ku ez nehîme dardakırın ev xebata ku dewletan û gelan kîr ez ji wana re pîr sîpasdikim.

Disa piştî dardakırınê diya Binyamin Moloisê û Avukatê wi bî hevra lî gel rojnamevana civinek pêkanin. Diya wi dî biranînê dawi yê kurê xwe weha ani zîman; " Bê şîk ez dîbêjîm ku

Binyamin dî derketîna dîji Hîkumatê da poşmanbûneke piçûk ji nişan neda, bî navê xwe tenezulê merhemetê ne-kîr ji hîkumatê."

Binyamin Moloisê bî serbilindi çû heqîya xwe. Ewi seri nîzîm nekîr ji nijadparêzan ra. Jî bo civateke demokrat û wekhev xwe fedakîr ji gelê xwe ra. Navê wi kete nav rûpelên dirokê yê avzêrdiyî weki tekoşerên cihanê. Ew carek mir. Lê bî serfirazi. Lê nijadparêz û koledar rojê sed car dîmrin bî bêşerefi.

Azadixwazêñ cihanê gerek Moloisê jîbirnekin. Dê dî dawiyêda serfirazi ya Moloisêyêñ cihanê be, rûreşî û sernizimayı ya nijadparêz û xwinxwaran be.

\*

## DAXUYANÎ

Dî hejmara 11'an da nîvisara Dr. Rehber RÊZAN ya li ser Celadet Bedirxan da rûpen 25 û 27 bî şashi cih guhartine.

Hevalêñ hêja, dî hejmara Roja Nû ya 11'an da helbesteki Vazgal Bazidi bî navê "Xani" hat weşandîn. Dî nav rîzêñ vi helbesti da bî şashi û xeleti çend çewti peyda bûne. Em bawer dîkîn xwendevanêñ me, ji ber vê yekê wê me bîborînin. Em lî jêr van rîzêñ şâş û rastiyêñ wan lî hemberi hev pêşkêşî xwendevanan dîkîn.

### SAS

Lî ser doza te karkîrîn  
Mahmûdê Beyazîdi,  
Eli Heriri, Goran....  
.....

Mele Cîzîri, Hejar  
Heya Cigerxwin  
Lî wi Xani da mezîn bûn

### RAST

Lî ser doza te karkîrîn  
Mahmûdê Beyazîdi  
Goran, İsmayelê Bayzêdi  
.....

Jî Eli Heriri, Mele Cîzîri hilda  
Te Xaniyê Çanda Kurdi dani  
Hejar, Bedirxanan  
Heya Cigerxwin  
Lî wi Xani da mezîn bûn

# NEWROZ



Nêziki 2600 salan beri nuha, gel lî  
diji hukumdareki zalîm bî navê De-  
hak seri hîdaye. Piştî raperineke me-  
zin bî serokatiya hesinkar KAWA, se-  
rê hukumdarê zordest tê pelîxandin,  
gel xwe ji zincirên koletiyê rizgar dî-  
ke. Ew roja serfiraziyê dîbe cejneke  
mezin. Roj 21'ê Adarê ye, destpêka  
baharê ye. Jî her ali va jiyanekê nû  
destpêdike. Dî wê rojê da şabûna mi-  
rovan û jindariya tabî'atê xwe dîgihi-  
nin hev. İdi ew hukmê zorkar û zivis-  
tana dîrêj û dijwar lî paş maye. Jiyanê  
rengeki nû girtiye. Lema 21'ê Adarê  
herwusa bûye roja serê salê ji. İro  
çawa gelê kurd wusa ji gelên irani  
yên din(Faris, Beluci, Taciki, û hwd)  
ji newrozê wek kevneşopiyeke giring;

wek cejneke gelêri xwedi kîrîne û heta  
nuha hersal ew piroz kîrîne.

Bûyera newrozê bî şirovekirîneke  
mitolojik, jî nîşan derbasi nîşan bû-  
ye û dî nav 2600 salan da,( dî nav ge-  
lîn irani da) ci-ciyan çiroka wê hatîye  
guhartîn; bî şewaki dîn hatîye gotin û  
pirozkîrin. Lê raman û daxwaza bînge-  
hin ango naveroka wê her wek xwe  
maye. Ew cejna serfiraziya gel e lî dî  
ji koletiyê. Ü ew mîzgîniya hatîna ba-  
harê, dûrketîna rojên zivistanê ye. Ra-  
mana xwe nûkîrinê û daxwaza avakîrî-  
na jiyanekê çêtir, stûna heri mezin û  
sereke ye dî bin tradisiyonâ newrozê  
da.

Dî rojêن iroyin da, dî hêla çandi da  
û dî tevgerê rizgariya netewi ya gelê



kurd da pirozkırına cejna newrozê wek kevneşopiyek şoreşger roleke mezin dileyize. Naveroka newrozê her dîce rengê siyasi dîgre. Êdi ew ne tenê wek cêjnekê tê pirozkırın, lê ew herwusa bûye roja yekitiyê û tekoşinê lî diji hêzên kolonyalist.

Dî nav gelê kurd da wek cejneke mezin û bî naverokeke şoreşger pirozkırına newrozê hêzên kolonyalist bê huzûr dîke, tîrsê dixe nav dîlên wan. Lema qedexe danine ser pirozkırına newrozê, nahêlin ku gelê me wê bî serbesti piroz bîke.

Lê van deh salêñ dawin da kîvşê ku êdi cejna newrozê bî awaki gîrsi û bî rengeki siyasi tê pirozkırın. Ew hersal jî sala çûyi xurttir tê pirozkırın. Dij-

mîn bî xetera vê yekê agahdar in. Lema ew dîxwazîn dirokê rûvaji bîkîn, serpêhatî û mana newrozê biguhurîn. Dî dewra cûnta faşist-kolonyalist da "diroknaşen tîrk" demagog û nîviskarêñ paşverû lî ser mitoloji û naveroka newrozê kitêban neşîr dikin, jî bo xatîrê inkarîna gelê kurd derewan diafrînin û lî cejna newrozê xwedî derdikevin. Lê êdi ew ji çare nine. Jî bo sazûmaneke ku lî ser zulmê, inkarkirinê û derewan hatiye avakîrin, şansê jiyanekê dirêj tuneye.

Gelê Kurdistanê bîryara şikandîna zincirên koletiyê daye û ew jî bo daxîstîna newrozeke nû, jiyanekê azad û rojêñ xweş şer dîke. Şerê azadiyê roj bî roj xurttir dîbe.

AN Jİ

# Kê Mahmut Perwer kuşt?



Beri bist salan endustriya Elman gelek hevcedari xebatkarên biyani bû, jî ber vê yekê elmanan hemû deriyêن xwe ji biyaniyan û bî taybeti ji xebatkarên Türk ra vekîrin, gazi wan kir û kar dane wan. Ev xebatkarana ji bo endustriya Elman hêzên xebatê yên gelek erzan bûn. Jî aliyê din da, ev kesana dî hemû karêن giran, qilêr û karên ne baş da cih girtin. Politka biyaniyan li Elmanya Federal dî destpêkê da xwe nerm û mirovi da xuyakîrin û ev kesêن xebatkar wek "Xebatkarên Mêvan"(Gastarbeiter) bî nav kîrin. Dî bin peyva "Mêvan" an da, du tişt veşarti bûn, yek jî vana dî destpêkê da xwe nerm nişandin, "mêvanhezi" bû, ev taktik bû, jî aliye din da ev kesana mêtvan bûn, ev kesana sêbê na dusibê wê herin welatê xwe, wek bûyereke derbazok hat nişandin. Mêvan pêwiste mêvaniya xwe bide ber çavêن xwe, xweyê malê van mêvanan nikare bî salan wek mêvan bîhesibine. Bî salan pêwendiyêن xudanê malê û van mêvanan her çû xirab bû, pêwendi sist bûn, mêvan û xudanê malê rabûn rûye hev, mêvanheziya Elmanan jî nişkêva, yekten jî ortê rabû. Ëdi mêvan bûn kesinê biyani, kesinê hov, diz, rîbir, ne dinêditi, bûn kesinê tolaz, angori Elmanan êdi pêwist bû, ev kesana jî welat bêñ avêtin, herine welatên xwe. İro gelek elmanên dilovan, xêrxwaz û biyanihez li hemberi vê bûyerê derdikevin û dengê xwe bilind dîkin li diji vê njadperestiyê "Têkili Hevalê Min Nebe" dîbêjin. Bî rasti dengê wan jî çiqas xurte? mirov pê nizane.

ROHAT

İro ev problem û serêşî li Elmanya Federal her dîçin zêde dibin. Pirtûka Gunter Wallraf ya bî navê "Yêñ Here Jêrin" ev râberzinan hin jî tûj kîr. Angori Gunter êdi ber devê lula tivingêñ elman "Cihudêñ Nûh" ango Türk, dî bin heft qatêñ jêrzeminan da rojêñ xwe dipêñ. İro çawa tê xuyan, delilêñ vê heyfildanê( tolhildanê) her dîçin zêde dibin, rewş xirab dibe.

Lê xebatkarên Kurd li kijan jêrzeminan da, li Elmanya Federal rojêñ xwe derbaz dikin, rewşa wan ciye?. Bersiva vê pirsê mirov nikare bî serê xwe bide, bersiva pirsê bî vê politkaya biyaniyan va girêdaye. Bî xwe gelek Elman Türk û Kurdan jî hev cuda nakin, davêjin tayeki teraziyê. Dî vi tayê teraziyê da xebatkarên ji welatêñ mayin ji hene, bî kurti biyani hene. Tayê teraziyeyi din da ji njadperest, burzuvaziya mezin û polesen wan hene.

Dî vê rewşê da tespitkirina rewşa kurdan, problemen wan û dî nav biyaniyan da cihê wan ciye? Niviskar Klaus-Peter Wolf dî romana xwe ya li ser Kurdan da dixwaze bigheje bersiva vê pirsê. Navê romanê "Die Abschiebung Oder Wer Tötete Mahmut Perwer" (Jî Welat Avêtin An Ji Kê Mehmut Perwer Kuşt). Roman dî sala 1984'an da bî elmani çap bûye, çapa duwemin jî dî sala 1985'an da derketiye. Dî nav rûpelên romanê da, pîrsa Kurdan, problemen kesêñ politik bî çaveki edebi û huneri têñ vekolandin, bî navê Kurdan rewşa biyaniyan li Elmanya Federal tê analizkirin.

Naveroka vê romanê paşê dibe babetä filmekî elman. Rejisör Marianne Ludcke dî vê filmê rengin û dirêj da, rewşa Kurdan li Elmanya Federal raxistiye ber çavê elmanan, Kurdistanê dide nasin.

Kortê Kurd Mahmut Perwer keseki ciwan û serwexte. Ew keseki politike, paşi hatına cuntaya faşist li Türkiye, ev bî dizi ji Türkiye derdikeye û tê Elmanya Federal dibe multeciyeki politik. Paşê pireke Elman, yeke xêr-xwaz û biyanihez, destê vi lawê kurd digre, odecke xwe dide wi û zimanê elmani hini wi dike. Eva fîrsendeke başe ji bo Mahmut Perwer. Lê problemên mayinê li Elmanya Federal ji bo Mahmut pirseke sereke ye, wusa nebe polêsen elman wi dişinin û teslimi polêsen Türk dîkin, du alternatif an ji ev herdu rê ber Mahmut sekînîne. Mahmut alternatifa mayinê li Elmanya Federal çêtir dibine û nasiya xwe dide keça elman Elke, dicidîne weki "lî ser kaxîzan" bî wê va bîzeweice û bîbe bajarvanê Elman, ji vê serêsiyê bifitile, xelas bîbe. Elka vê yekê cida dibine, dîçin da-dîgehê bî formalite li ser kaxîzan dizewicin. Elka hevaltiya xwe ya jîn-mêraniyê ji bî la-wîkeki din ra dajo

Çawa dî romanê da, wusan ji dî filmê vê romanê da hemû bûyerên mayin, paşi vê zewaca derewin, şax vedîdin, fireh dibin û tehreki realist va bûyer bî hevra têngirêdan.

Dî despêka film da tişteki baş xuya dibe, ev kesen "Por Reş" kine, çi dîkin li Elmanya Federal, jan û eşen wan çîne li vir? Ev pîrsana baş tênganalizkirin, perden tari têngveqelaştin. Bavê keçikê (Harald) û diya wê (Eva) ji ber vê zewaca derewin, di despêka da berxwe dikevin, ditîrsin. Paşê ew dest davêjin ferhengan, dî ferhengan da peyva "Kurd" digerin, ew rastiyekê digerin, ew pey hemû bûyeran dikevin, dixwazin fêr bibin. rewşa biyaniyan, ew hêdi-hêdi bî çavên xwe va dibinin. Zordesti, nebaşı û te-dayen li biyaniyan dibin, ev yeka vê cara bala van dê-bavan dikşine ser xwe, ew dixwazin alikariya biyaniyan bikin. Dî film da gu hastina bir û baweriyêne pêşin, gu hastina mirovan bî lez pêşta dîçin. Rewşa kurdên tengezar û neçar, wusan ji tekoşina biyaniyan dî film da puwangêne pozitif distin. Jî bo şkandina tesira baweriyêne çewt, xelet û njadperest ev filma bî gelek ditem û sehneyêna baş va xemiliye. Elke, ew keçika ku bî şikli Mahmut va zewciye, dema dibine weki

lawkê wê (Bodo) keseki dewlemed û li diji biyaniyan, dixwaze bî polês va bîxebite, Mahmut ihbari polês bike, Elka wi sosret, rezil dîke, pêwendiyêne xwe jê diqetine, Elka dî film da ciheki pêşketi digre û naxwaze xwe bî pul-pera bifroşe.

Dî dawiya film da, tê xuyan weki polêsen elman Mahmut Perwer bî balafirê va şandiye Tirkîyê û teslimi Tirkîyê kiriye. Paşî çendeki xebereke reş ji Elkayê ra tê weki polêsen Tîrkan Mahmut kuştîye. Jî ber vê xebera reş Elka, dê û bavê wê, ker-gêj dîbin, dî nav dengê qirin û qijinê da film xelas dibe. Bî vi tehri "Kê Mahmut Perwer Kuşt" bersiva vê pîrsa niviskarê romanê ji, diyar dibe.

Rojekê beri nişandina vê filmê dî televizyonâ Swêdê da, rexnevanê filman Sven Strom dî rojnama "Expressen" dînivise weki "Ev Filma Lî Swêdê ji gelek Aktuel e" \*

Film bî xwe filmekî dokumenter nine, filmekî jindare, mîrxas û listikvanen film hene. Heta niha hemû filmen ku bî desten biyaniyan, li ser kurdan hatine amadekirin, bî taybeti kurt û dokumenterin. Jî ber vê yekê filmê "Jî Welat Dürxîstîn" (Die Abschiebung) wek filmekî gelek hêja dikare bê hesibandin.

Roman bî xwe ji, ji bo ciwanan hatiye ni-visandîn, zimanê wê sıvíke. Jî bo perwerdekirina nîfşa nûh li Elmanya Federal, filmen wek vi filmi, kişandîn û nişandina wan gelek kîrhati û suđmendin.

Gava tê xuyan hukmeta Swêdê, an ji sazgeha Radyo û Televizyonâ Swêd li ser pîrsa biyaniyan li Elmanya Federal baş dîsekine û wek pirseke bingehin ji xwe ra dibine. Jî ber ku pîrsen biyaniyan bî taybeti pîrsa koçerên Kurd li Swêdê ji aktuele. Be-ri salekê li Swêdê nişandina filmê "Jî Hewayê Sıviktir" vê baweriya me hin ji xurttir dike

Çawa tê zanin, ev filma ji lî Berlinê Rojava hatiye kişandîn û têda serpêhatiya keçekê Kurd-Eyşanê heye. Ev filma bî gelek rasti, fantazi û xewnerojan va tijiye. Eyşan li Elmanya mezîn bûye û wê Kurdistan bî çavan neditiye. Bavê Eyşanê dixwaze bar kîn herin Kurdistanê, Eyşana reben naxwaze here li vi "Welatê biyani" (Kurdistan), ew bî balona rengin va dîlize, yek rast lêdixe, yek çep lêdixe û ev balona sıvik û nermok wek xewnen şevan Eyşanê dibe-tine Kurdistanê.

Îro ne tenê Elmanyê û Swêdê, wusan ji  
rewşa Kurdên li welatên dereke, wek Aust-  
ralyê, Frenşê pêwîste dî hemû karêñ çand,  
huner û edebi da rûçekêñ xwe nişan bîdin.

Pîrsêñ abori, cîvaki, politik û çandi li van we-  
latan li ser Kurdan çî tesirê nişan dîdin, an  
ji kurd van pîrsan bî kijan penceran va dibî-  
nîn, pêwîste bersivêñ van pîrsan bêñ dayin.

\* Vasttysk Drama Om Invandrare, Sven  
Stom, 22.3.1986 Express

\* Film om kurdisk Flicka, att flytta hem,  
Dagens Nyheter 29.1.1985

## FERHENGOKA KURDİ - TIRKİ

Alikar	Yardım eden, destekleyen	Hov	Vahşi
Alikari	Yardım. Destek	Hoviti	Vahşet
Alikarikirin	Yardım etmek. Desteklemek	Kavîl	Harabe
Ango	Yani	Karbîdest	İşbirlikçi
Armanc	Amaç; gaye	Kevneşopi	Gelenek, klasik
Asmani	Soyut, abstrak	Komeçîvin	Kongre
Awerte	Geçici	Komita Karger	Yönetim Kurulu
Bahoz	Sert rüzgar, fırtına	Kovar	Dergi
Bal	Dikkat; poz, görünüş	Lap	En (En büyüğü) tamamen
Balinde	Kartal	Lewra	...den dolayı, çünkü
Bandor	Tesir, etki, boyunduruk	Lema	...den dolayı
Belavok	Bildiri	Lome	Sitem, yakarış
Berbiçav	Konkret, somut	Malbat	Aile
Berendam	Aday üye	Mebest	Niyet; amaç, dilek
Berevkar	Derleyen; toplayan	Mîndal	Çocuk
Berxwedan	Direnmek; direniş	Mina	...gibi
Cejn	Bayram; şenlik	Minak	Örnek
Ciwan	Genç	Nav	İsim; iç, orta
Çap	Basım; baskı	Navin	Ortanca, orta
Çapkırın	Basmak	Nawend	Merkez
Çapxane	Basımevi; matbaa	Nawendi	Merkezi
Çarelékirin	Çözmek, haletmek	Netewi	Ulusal
Dadgeh	Mahkeme	Nijad	Irk
Daristan	Orman	Nijadperest	Irkçı
Dazani	Beyanat, açıklama	Nıştîman	Vatan
Destür	Müsade; izin; tüzük	Parastün	Savunmak, korumak
Êş	Ağrı	Parêzgeh	Savunma yeri
Êşkence	İşkence	Paşeroj	Gelecek günler, istikbal
Êriş	Saldırı	Paşverû	Gerici
Gazin	Sitem, yakınma	Peyman	İlerici
Gengazi	İmkan, olanak	Pirtük	Antlaşma, sözleşme
Gûring	Önemli	Raman	Kitap
Gîsti	Genel, genel olarak	Râçavkirin	Düşünce, fikir
Girtixane	Hapis, tutukevi	Raperin	Gözden geçirme
Gotubêj	Sohbet, söyleşi	Ronakbir	Ayaklanması, isyan etmek
Herêm	Bölge	Rûpel	Aydın
Hevrê	Yoldaş	Seranser	Sayfa
Hêja	Değerli		Baştanbaşa, boydanboya
Hejandin	Sallamak, sarsmak		

## RAGIRTIN

*Em li jêr serpêhatike Xelil Dihoki bî navê "Ragirtin" diweşinin. Serpêhati bî zaravê behdinani hatye nivisandin. Em zêde têkili orjinalê nivisarê nebûn. Ji bo xwendevanê me baş têbighên, me di dawiya serpêhatiyê da ferhengokeke piçük pêva kiriye.*

\* Ez vê Serpêhatiyê ji hevalê xwe kak Fuat ra pêşkêş dikim.

### XELİL DIHOKİ

Lezê bike, raste derya tiştekê bî sehme, rizgarbon kareki pir zehmete. Lê mirov ji asteng û tengaviya mezintire. Her çende te çı hêzeka mezin nemaye. Lê ya fireh hêjtan hewl bidey.

Lezêbike, her wextê te bîryar day xo bavêje avê pêngaveka dî cihê bû. Ger te we nekirba, da demekê dîn ji bî demancê şeri key, da çendên dîn ji kuji û bîrindar key, lê da bê gulla mini û dêyekuştıyan ji girtin. Lî nîk te kuştın baştırbû ji girtinê, ger tu girtibay, da te bî sêdarêve ken, lê pişti karên xo dî gel te bî dîmahî dî inan. Dî gel hindê ji te dizani, ko "Karekê xirabe mirov bîçi te dî nav şerekê da û encam têçûnbit". Lewran te bîryara derbazbûnê da. Ger tu girtibay, da te kîrêt ken û ji vê zîndanê bo ya di. Ji vê ezyet û lêdanê bo ya di, eve ji çinebû, lê dîviya te bersîva pîrsen wan ji daba. Raste te dî kari xo lî ber çendin gurza ragiri. Lê mirovi ta pîleyekê taqet û şiyan hene. Disa wehebû, te ne şiyaba, çînko te bî dehan cara ji wan kesen dî zîndana da guh lê bibû, ka çı dî inan serê şorîşgêra, xo lî ber çavên

te wextê hêj lî bajêri, bî sedan kesen bê guneh û jar dîgirtin û berze dikirin. Xo lî bira te bû demê xoşka Nazdar Basi dest û darê zîndanê dikir.

" Dî karxanê da girtim, dî nav joreka pir kel û pelên ezyetdanê da mirovuk lî ber çavên min dane ber kaşoya û kujtin, rakırın û dî pencerê da havêtine xarê. Diviyan bêjîm ka çend kes dî gel minin û em çı pilana dîgerin, çı karan diji hukmetê dîkeyn. Kaxëza bo kê dî beyn û narincok û demanca bo kê dinin. Lê demê min çı nedaye desten wan, cîlkîn min dirandin û ez bê ser û ber kîrim, min bî xûdê û qoranê dane sindê, lê bî min kenin û cirte lî min vedan û bî desten xo yên geni leşê min piskîrin. Tîleka kareba du layi anin, layek êxistîne tîhala min û yên di êxistîne cîhekê di yên leşê min. Her careka kareba(beriq) dîdane kari, agir dîkete nav hinavên min û axin û qêrin ji min dîçûn û rondik ji çavên min dîpeşin. Bî sedan qîsen kîrêt û ne jêhati gotine min, demê çı sod û mîta ji min nediti, ez hinartime jora".

Lezê bike te niveka deryayê derbaz-

kiriye. Ev kiras û kaxez û raporte gelek gîranın. Her çende hemi nabine du kêlo, lê bo vê tengavyê û vê rêkê gelekin. Ger tu pêve westiyay, berde nav avê. Demace dê niqutek û bete binê deryayê û dojmîn çi sodê jê wernagirit. Diyare to bê taqet boy, berde da pêtir bishêy melevan'ya bî key. Her wextê te ew tişt kirine dinav kira-sida û êxistiye serê xo, ji piştve, ji ber pêla av çô nav û gîran bû. Lewra pişt-ti bêhneka melevaniya te dî destê xo girtin. Bî destekê melevani û bî yê di tişt, karek qurse û nexoşe. Her nûke berde, da pêtir bo rizgarbonê hewil bidey. Berde, her wextê te berday, hêzek di bo te peyda bû. Tu bî vi kari nexoşbo, lê mesela rizgarbonê gîring-tire, çînko " mirov mezintîrîn sermaye ye".

Lezê bîke eve daxaze lî ber çavêne te yarya diket. Ger to rizgarneboy, bêjte kê law eskerey. Hewe hizra hîndê dikir, ko mirovên çepel, sixor û kîrêgirti, pîrsyara ji zaroka ji diken û ger bîzanın tu peşmergeyi, dê wê û deyka weji gîrin. Xo niho bî hizara jîm û za-rok û piremîr-kes û karêن yê dî zindanêñ faşîyan da. Bî dehan kes ji kêmkarin û nebona saxlemyê û lêdan û eziyetdanê dîmirin. Gava bû ditîna te dihatne deveren rizgarkiri, dîgotne babê te eskere. Weko wêji tu di-ti dîgot: Law eskerey!! xo esker van cilkan nakene berxo!. Dîzani tu ne es-keri, lê ne dîzani bêjît pêşmergeyi.

Lezê bîke nêzike dê ji deryayê riz-garbi. Çi nemaye, temaşey pişt xo bîke. Te behra pêtir ji deryayê şeqandîye, Heşta te taqate hey divêt xo riz-garkey. Te çi rê nebûn. Sê lawêñ te derya û layê di posa dojmîni. Dengi ji

xo neine, nexo dê te dî avêda kojin, yan ji gîrin, ger tu girti. Xo te sohbeta azadi ji bir nekîrье.

"Êkanebûm, her ji bîcikati dîgotin, xo biparêze û çi karêñ xîrab dîji hokmetê nekey. Dirondeye dê te serjêke. Lî nik xo ez dîtirsandim, lî nik min pêtir kerb û kin beramber hokmetê peyda dîbû, min bî dehan belavok û namîlkîn şorisê dî nav xandingeh û kola-nîn bajarê da belavdikirîm. Sihariyekê dî peymangehê da girtim. Jî vê zindanê bo yadi, herçî ezyet û lêdan hebo bî kar inan. Zivistana em dîkirne dînav ava qerisida. Havina ji dinav ava gelek gerim da. Quran dî inan û dîgo-tin pê sindbîxo, lê demê me destê xo dî dana ser êk, ser dî hatine kareba kîrin, çînko quran ya bî kareba bû. Lî pêş çavêñ me xelk dîkirne dî nav bîrkîn pîr tizab da. Demê min çi nedaye destêñ wan, efserekê kurêt got: Ger tu hevalêñ xo aşkerannekey, dê lî te si-yarbin".

Lezê bîke raste sare, serê te dî êşit, destêñ te baş ranabin, pêñ te bî dîrosti nalîvin, behna te bî zehmet dî êt û dîçit. Lî divêt xo rizgarkey. Te gelek ji deryayê bîriye û tu neşey paş-ve bîzivri. Her divêt xo ragiri, yan ji dê mina tiştêñ xo çiye binê deryayê û biye xarîna giyan lî behra(heywanêñ behrê).

Lezê bîke ger xo ragiri, dê derbazbi mirovê xudan bir û bawer û iradeka mohkim, hemi astenga dîşkênit. Her çi karêñ zehmet hene xo jê qurtal diket. Xo te ridanêñ wan girtiyân bîhistine. Ku bî dehan roja xarin nedixarin. Disan te çiroka wi pêşmergê bîrindarê bist û çar roja bê xarin û derman may, guh lê bûye. Bî sedan ca-

ra pêşmerge ketine posên pir nexoş-  
tir. Xo ragire.

Lezê bike, neko bî bite roj. Paşı rız-  
garbona te dê dirbit. Her çende ev  
deryaye ya rawistaye û bî rêve naçit û  
av te beref çi laya nabet. Lê to gelek  
rengêñ melevanya dizani. Car mina  
beqa, lî ser piştê baska bikarbin. Çi  
nemaye, her bî gehye layê di, dê jî gi-  
riftariya sereki rizgarbi. Dê şêy bû  
çend deqiqa bêhna xo vedey. Demê  
to ketye boşê, dem jimêr nêziki êkê  
şevê bû. Behra pêtir ji şevê çûye. Lê  
hêstan maye xo pê ji cizirê qortalkey  
û bî gehinye çiyayê bîlind û asê.

Lezê bike tengavi dî kurtin. Piş-  
ti tehliya dê gehye xoşıya. Xo ragire.  
Her dest û pêñ xo bîlvine binve  
nabi, mesele her rizgarbûna te nine,  
belko rizgarbûna dehan nihêniyêñ  
şorışêne. Her çende te hindek ni-  
hêni berdane binê deryayê, lê hêş-  
tan derya mejyê te pire ji nihêniya.  
Ger te bigrin weheye neşey bî parêzi.  
Çinko ew ezyet û lêdana rijêmê taqet  
û şiyana bo xelkê nahêlit. Lê tu dê xo  
ragiri û parêzi. Disan kesen xo ne ragir  
gelek dî kêmîn. Ger weneba ev rejima  
geni da miletê me ji nav bet. Şorışger  
û dilsojêñ me baweryeka mohkîm ya  
bî rizgarbûn û serfiraziye hey û bû hin-  
dê xebateka dir û dirêj diken, dizanın  
ku " hemi tariya cihanê nikarit rona-  
hiya fenerekê bî veşerit".

Lezêbike, rizgarbûna te serkeftine-  
ke. Mebest lî rizgarbûnê her jiyan nine  
û bes. Belko da pêtir lî ser xebat û bi-  
zavê berdewam bi. Da pêtir sengerên  
dojmîni bîşkêni û çend qonaxêñ dî ji  
bû pêşve bîçi. Raste ji mîrnê natırsit.  
Lê dîvêt xo biparêzit da hêstan ziya-  
nê bigehinte dojmîni û zitir miletê xo  
bigehinte kînarê serbîlindiye.

Lezêbike, temâşake çi nemaye. Ya  
may kêmtíre ji ya çûyi. Xo ragire da  
bî şêy bî sedan ridanêñ hosan bîkeye  
hozan û çirok û dastan. Da bikari ala-  
yê miletê xo dî nexşeya cihanê da bî-  
çıklını. Da hîzaran serborêñ mîranyê  
bo zarokan vegêri. Gava mîlet rizgar-  
dîbit da bîzanın ku bî xoragirtin û qor-  
bani û xina hîzaran şehidan rizgarbûn  
peydabûye.

Lezê bike tu ji dojmîni dîrketi.  
Dengê wan ji naête guhêñ te. Lê hêş-  
tan bî dîrîsti rizgarnebûy. Şev ya beref  
dimahiyê dîcît. Gerto ji deryayê der-  
kefti, ji nika dê gehye Cizirê. Her sı-  
hari dê kopter(firoke) siberê lê ken.  
Dê êne xarê û lî te gerhêñ. Lewran  
dîvêt her çi hêz te heye bikaribini da  
bî zitîrin dem xo ji deryayê û cizirê  
kortalbikey û bigehinye binarê çiya-  
yê bîlind.

Lezêbike, raste tu gêj û bîrsi û şe-  
pirzeyi. Lê dê kari bû demekê di ji xo  
ragiri. Çi nemaye, mîrov gelek bî taqe-  
te, tu ji hêstan genci. Ger xo neragri û  
derbaznekey. Weheye ji ya hatye serê  
heval Zireki xîrabtîr bîbini. Te lî bire  
wek digot: "Sixoran lî ber dîkanê des-  
tîn mîn kelebçe kîrin û heta ez gehan-  
dîm bî dehan tif û şeq û pêñ lî mîn  
dan. Zanîbûn ku mîn şekir û tov û do-  
hîn û ar bo yêñ seri hinartibûn. Dîvi-  
yan hevalêñ xo aşkerakem. Mîn çi ne-  
da destê wan. Wan ji texsir nekîr.  
Neynokêñ mîn kit-kit helkeşan. La-  
yêkê çermê serê mîn kevilkîrin. Ez  
mina povdankê povdam, gonêñ mîn  
herişandin, ez dîkirme dinav joreka ge-  
lek tarida û çavêñ mîn dîdan. Leşê  
mîn sedan cara dane ber karebê.  
Qopkêñ cigara lî ser cihêñ nazik lî la-  
şê mîn dîvemîrandin. Agirekê mezîn  
nêziki ser û çavêñ mîn dîkirin heta

ku dî bûne povdank. Çı bêjim her çi ezyet heye bî kar inan. Lê ew dizanım bî agir û aşını nikarın miletê me jî nav biben. Ew dizanın bî kojtina zarok û kalan, bî wêrankırına gond û bajêran, bî sotandına daristan û baxan, bî vego-haztuna xelkê me bû dever û cihêñ dûr û biyabanan nikarın welatê me çolken û bir û bawerên me bin axken. Her çi karêñ nemirovane hebûn dîgel min kîrin. Lê neşyan sodekê jî min wergîrin

û min biroxênin. Heta gehıştiye hîndê ez bî ser bîtli vekîrim".

Lezê bike, madem te ev vidan û bîrine lî ber çavîn, yê dî mejyê te da xo dî hilavêjin. Xo ragire û Lezê bike, çi nemaye, dengê pêlêñ avê nêzik diêt demê bî kevrêñ kînarê deryayê dîkevin. Xo ragire ha-ha dê gehi. Her wextê destêñ te bî kevreke layê di yê derayê kefti, te bêhna paşerojeka geş û nû helkêşa.

## FERHENGOK

Serbori	: Tecrube	Sêdar	: Sêpi, sehpâ
Mifa	: Sud, Kêrhatin	Di	: Din
Hînartin	: Şandîn	Şîyan	: Kanin, Karin
Nuke	: Niha	Berzebûn	: Wundabûn
Yari kîrin	: Listin	Sod	: Sud, Kêrhatin
Hîzîr	: Fîkirin	Qurs	: Gîran
Çepel	: Pis	Jor	: Ode, Odax
Sixor	: Cesus, Ajan	Pile	: Hed, Derece
Dever	: Hêl, War	Kel û Pel	: Tişt, Eşya
Êkane	: Tenê, Bî serê xwe	Kaşo	: Dar, Şiv
Êk	: Yek	Viyân	: Xwestin
Dîrînde	: Hov, Kuvi, Erişkar	Narîncok	: Bomba destan
Namîlk	: Broşur, Kitêbok	Kareba	: Elektrik, Cereyan
Peymangeh	: Enstitu	La	: Ali, Tang
Qerisi	: Cemidi	Povdan	: Gupik, Balon
Bîrk	: Hewz	Bîtil	: Şuşe
Efseni	: Zabit	Biyaban	: Sehra, Deş,
Ridan	: Büyer, Qewmandin	Kevîl Kîrin	: Çerm kîrin
Berif	: Berbi	Demjîmêr	: Seet
Gîriftari	: Nu subet	Fer	: Pêwist, Ferz, Hewcedar
Siber	: Si	Gon	: Hêlik, Organê cinsi
Bîrsi	: Birçi	Xo	: Xwe
Tif	: Tu(kîrin)	Ragirtin	: Berxwedan
Dohîn	: Rûn	Nîk	: Bal, Cem, Lî gel
Dov	: Çay, Şekir û dov	Tizab	: Madeke Kimyayı
Hawîldan	: Cehd kîrin	Şêlk	: Barandîna gullan bî hevra
Pêngav	: Gav	Binar	: Bin

# BEŞDARBÛNA ÇEND KURDAN DI KONGRA PYKS DA



Çawa hun dizanın isal dî roja 25.3.1986' an da lî Moskov, kongra Partiya Yekitiya Komunistên Sovyet(PYSK) dest bî xebata xwe kîr, vê kongrê deh rojan ajot.

Dî kongrê da pênc(5) hezar kes besdar bûn, hemiyan bî yekdengi kursa komita navbendi, kar û xebatêن wê silav kîrin, kêfxwesiya xwe diyar kîrin. Kongrê bî peyva M. S. Gorbaçov destpê kîr.

Dî nav pênc hezar kesen nûner da, jî hemû gel û neteweyêن Yekitiya Sovyet gelek kes besdar bûn. Dî nav wan da wusan ji 2 kurdan cih girtin. Yek jî vana Nodarê Memreşî, jî Gurcistanê, yek jî, jî komara Qazaxistanê Kubara Dursunova bûn.

Em dî serê seri da bêjîn, lawê Kurd Nodarê Memreşî endamê parlementoya Gurcistanê ya Bilind e. Ew lî Gurcistanê hatiye hilbijartın wek endamê Komita Navbendi, paşê jî hatiye hilbijartın wek delegeyê kongra 27'an ya Partiya Yekitiya Komunistên Sovyet.

Nodarê Memreşî, ev heşt(8) sale dî karxanê da dixebîte, dî nav van salan da bî saya xebatheziya xwe, ew gihiştiye gelek serfiraziyên berbiçav, nav û dengê wi dî temamiya komarê da hatiye bihistin. Gelek rojnamên Gurci û kovara Riya Teze lî ser xebatên vi lawê Kurd nivisarêن hêja weşandine. Bermaliya Memreşî-Besa Peyale dî nav kurdan da jina pêşin e ku büye endamê Yekitiya Wênekêşen Yekitiya Sovyet. Wêne û xaliçen ku wê çêkirine temasgehêن gelek

welatêن cihanê da hatîne nişan dîn. Temawan efrandinêن wê bî taybeti rewş, jiycin û pêşketîna Kurdêñ Gurcistanê ye.

Keça Kurd, bîneciya navça Cembûlê (komara Qazaxistanê) Kubar Dursunova rençbereki nav û deng e. Ew keseke rastgo, mîvanhez, dayikeke xemxur, keseke xebatbez e.

Jî ber van xeysetên xwe yên baş, ew hatiye hilbijartın wek endamê komita navçe ya partiyê. Paşê ew jî aliye hevalêñ xwe da hatiye hilbijartın weki here tevi kongra PYSK ya 27'an bîbe.

Ewlâdêñ Kurd, Nodarê Memreşî û Kubar Dursunova edi vege riyanê malêñ xwe-Tiblis û Cembûlê- dî nav heval-hogiran da bîryarêñ kongra partiya me ya eziz yek bî yek jî wan ra şirovedikin, wana ruhdar dikin, berbi mîrxasiyên hê bilind, jî wan ra derbari politika partiya me, politikaya der û hundur ya aşitixwez da qise dikin.

Her wusan ji nûnerên 150 partiyêni bîyani (dereke) ku 120 welati zêdetir hatîbûn tevi xebata kongrê bûn, jî wana gelekan politika partiyê silav kîrin.

Dî nav mîvanan da wusan ji ewladêñ Kurd, Sekreterê partiya Kominist Ya Iraq Eziz Mehemed û Sekreterê Partiya Kominist Ya Suriyê Xalid Bagdaş hebûn.

Eziz Mehemed, dî nav peyva xwe da wusan ji diyar kîr ku Partiya Koministên Iraqê şerkariyê dike jî bona Demokrati lî Iraq û Xwemuxtari lî Kurdistanê.

**TİMURÊ XELİL**

# pirê û mamê rovi

## DİJLE BELÇİM

Zemaneki lı gundeki Kurdistanê pirê hebûye. Belê ew pirîka han gelek xizan bû ye. Jî derveyê du mihan, tu tiştê wê tunebûye. Her roj pira me wana didoşe û jiyana xwe ya rojane bî wana dîdomand.

Rojek pirê disa mihên xwe didoşe û şirê xwe datine ser kulekê. Dîce na-va gund qasek digere. Gava pirê jî gerê tê, dîbine ku şirê wê ne lı ciyê xwe ye. Ew şev pira me dî nava kul û kese-randa radîzê. Sîbê radîbe, disa weka her caran şirê xwe didoşe û sitila xwe disa datine ser kulekê. Lî xwe lı ber deri vedîşere. Dîbê;

- Gelo ew kiye ku hatiye şirê min diziye? gereke ne gundiye min bin. Lewra ewana baş dizanın ku ez gelek xizanim û jî derveyê sitilek şir tu tişteki min tuneye. Ez bawer nakim ku ewana çev berdîne şirê min.

Pirê piçek lı pişt deri disekine. Hew dîbine ku roviyek hat, rast çû ser ku-lekê û devê xwe xiste nav sitila şir û vexwar. Pirê hedika jî pişt deri dasê hildide û duvê rovi qut dîke. Rovi bî eşa duvê xwe direve û dîce. Gava dîce nav hevalêن xwe gişt pêdikenin.

Roviyê bê duv, ka duvê te, Roviyê bê duv ka duvê te?

Rovi lı kena hevalêن xwe gelek qe-hîr û şermezar dîbe. Jî ber vê rewşa nexweş, jî cem hevalêن xwe bazdi-de. Rast dîce ba pirê û hevi û lava dîke.

Pirê, pirê ka duvê min bîde!

Pirê mamê rovi dûr û dirêj jî ber çev derbazkir û go:

- Mamê rovi ka tu jî şirê min bîde, ku tu şirê min nedî, ez jî duvê te na-dîm.

Mamê rovi stuwê xwe xwarkir û çû. Qedereki meşîya. Rasti çelekekêhat. Jî çelekê lava û hevi kîr:

- Çelê, çelê ka şir bîde, şir pir bîde, pir duvê mamê rovi bîde.

Çelek guh dîde mamê rovi û dîbê;

- Başe, lê pêwîste ku tu jî min ra giya bini.

Rovi jî wê ji bî xemgin dîce. Dîce dî nav zeviyeki da derdikeve. Jî zevi-yê ra dîbêje:

- Zevi, zevi ka giya bîde, giya çelek bîde, çelek şir bîde, şir pir bîde, pir duvikê mamê rovi bîde.

Zevi temaşa melûlbûna mamê rovi kîr û jê ra got:

- Başe. Here dasukê bine.

Mamê rovi temaşa dor û berê xwe kîr, tu dasukek nedît. Disa kete rê. Bi lez û bez xwe gihande ba hedad. Dest bî lava û hêvi kîr.

- Hedad, hedad dasuk bîde, Dasuk zevi bîde, zevi giya bîde, giya çelek bîde, çelek şir bîde, şir pir bîde, pir duvê mamê Rovi bîde.

Hedad go:

- Ez meçane qar nakim, ez jî xwedi zarû û zêçim. Bo ku ez xwestîna te

binime ci pêwiste ku tu jî mîn ra pênc hêka bini.

Rewşa mamê rovi zor e. Xwe disa sítuxwar kîr û çû cem mîrişkan. Jî wana ra bî dengeki dîlşewat got:

- Mîrişk, mîrişk hêk bide, hêk hedad bide, hedad dasuk bide, dasuk zevi bide, zevi giya bide, giya çêlek bide, çêlek şir bide, şir pir bide, pir duvê mamê rovi bide.

Mîrişk gişt bî hevre dîkîne qireqir;

Ma tu nabini ku em jî birçiya dimrim. Jî bo ku em bikarbin hêka bîdîn te gerek em têrbîn. Here jî me ra qut bine.

Mamê rovi jî cem mîrişkan ji bî lez û bez dice. Hûr dice, dûr dice, rasti lîdêke genim tê. Jî loda genim hînek genim hîltine, tîne dîde mîrişkan. Mîrişk hêk dîkîn û dîdîne mamê rovi.

Mamê rovi hêka dîde hedad, hedad dasuk dîde mamê rovi. Dasukê dîbe ber zeviyê, zevi giya dîdê . Giya dîbe dîde çêlekê, çêlek sitilek şir dîdê û bî dîleki xweş satilê hîltine dîbe dîde pira me.

Pira xîzâr bî van kîrinê mamê rovi gelek dîlxwêş dîbe. Gava şirê xwe dîstîne, duvê mamê rovi dîxemline, gelelek mori û pullîka pêve dîke.

Mamê rovi duvê xwe yê xemîlandi hîltine û gelelek bî kubari dice nav hevalên xwe. Hevalên wi sedem vê xebata wi payeyêke bîlind dîdînê. Mamê rovi dîbe serokê wana. Bî roj û şev lî wana şîretan dîke ku kes nekeve nava şâşîyan. Her jî wana dîxweze ku her kes bî dîrusti qar bîke.

Çiroka me çô deviya, xweşi û başı jî bo me hemûya.

\* \* \* \*



ALEXANDER SHEVCHENKO  
Kurdish Women  
(Jinén Kurd )

# TİYATROYEKE MUZİQAL

## EVİN

*Di jiyana gelan û pêşketina wan da faktorên siyasi, abori û ciwaki çawa rolek bingehin dileyize, rola sinet û çand ji her wusa ciyeki giring digre. Kolonyalizm û siyaseta wê pêşya pêşketin û kemilandina milletan bend duke û nahêle çand, huner û motivên netewi pêşkeve. Ev siyaset ji bo windakirin û asimilekirina hebûna netewi ya gelane. Ji bo pêşketin û kemilandina milletan, dwê zincirê koletiyê bê şikandin û tekoşinek bê westan di her wari da bê ajotin.*

*Di vê tekoşinê da, dwê merw tucar kar û xebatê çandi û huner pişt guh nexe, giringiya rola vê xebatê piçük nebîne. Piçük ditina vê xebatê koritiye, bêfamiye û di dawiyê da piçük ditina tekoşina netewiye.*

*Sinet, folklor, bêje, ziman û gelek hebûnêne me yên netewi ji mc hate dizin û wan dizên kedxwar bê fedî li ser mirata me rûniştin. Bi taybeti li Kurdistan'a Tirkiyê zordariyê nehişt ku bi*

Hemû hejmarê Roja Nû hertim dighêjin des-tê min.

Bî zimanê me, derketina kovareke waha edebe û çandi me gelek kêfxweş dike. Gelo mirov çawa dikare ferhengeke Kurdi-Türki peyda bîke? An ji imkanêne amadekirina ferhengeke wusan tune ye gelo? Min di hejmareke Roja Nû da xwendibû weki ferhengen Kurdi-Rûsi hene, mirov nikare van ferhengan wergerine zimanê Kurdi? Hun ber-sivêne van pûrsêne min bîdin, wê gelek baş bîbe.

Hejar

zimanê kurdi nivisandin û xwendin pêşkeve û disa bî zimanê kurdi sinet( cinema, tiyatros, wêne hwd) berge li xwe firehke. Lé di van çend salén dawin da, di warê çandi da gelek efrandinê hêja derketin holê û roj bî roj hejma-ra ronakbiran, niviskaran, folkloristan, bêjezanen û siyasetzanen zêde dibe. Em bî vê yekê kêfxweşin û édi em dizanin ku gelê me bî xwe hisi-yaye û rojêni roni yên me ne.

Ji wan kar û xebatê hêja nimûneyek di şeva biranina Cigerxwin, Yilmaz Guney, Ruhî Su û Vasfi Öngören da pêk hat. Di vê şeva biranîne da(25.1.1986) tiyatroyek muziqal, bî zimanê kurdi, bi stran û toreyê kurdi hate nişandan. Ev tiyatroya muziqal ji ali Listikvanen Gel va hate amadekirin û serlistikvanen tiyatroyê Hozan Şwan û Gulistan bû.

Naveroka tiyatroyê, ji-yana gelê kurdi, paşda-xistina wi, tore û çanda wi, zûlm û zordariya kolonyalis-tên Tîrkan bi awaki muziqal

hate nişandan. Di listikê da toreyê gelê kurdi, rewşa wi ya ciwaki, ne razibûna wi di-jî kedxwaran û şerê pêşmergê qehreman, sembla azadiyê, hêviya gelê kurdi hate diyar-kirin.

Bê şik, amadekirina tiyatroyê bî zimanê kurdi şanoya yekem bû. Di tiyatroyê da tişteki gelek zelal kifş bû, ku zimanê kurdi û tiyatros xweş li hev tê. Şanoya duduwa ew bû, ku lîstik û rengê buyerê muziqal bû. Serlistikvanê tiyatroyê Şwan û Gulistan bi dengên xwe yên xweş û bi hunerên xwe yê listikvaniyê bala temâsevanan kişandin. Ji bili vana çek-libas(kostüm), ser-raskirina sehnê û pêşkeşkîrina listikê bi awaki hunerî gelek serfiraz bû.

Xebatek weha di warê sinet da valahiyek da-digre û li ser temâsevanan zê-detir tesir peyda dike. Ji ber vê yekê, giringi û domandina xebatê weha li pêş çave û bê şik firehkirina wan û çêtirinê wan pêwiste.

### PIRSEK Û BERSİVEK

Gotinêne we rast in, li Yekitiya Sovyet gelek ferhengen bî duziman hene, wek (ferhen-ga Kurdi-Rûsi, ferhenga Rûsi-Kurdi...). Lé amadekirina ferhenkeke Kurdi û Tîrki li ser bingehêne van ferhengan kareki ewqas hêsa-nine. Cara pêşin pêwiste pisporêne van herdu zimanen zanin hebin, wext û imkanêne abori hebin. Hemû ev yekana di rewşa iroyin da wek probleman têne xuyan. Lé em bawer di-kîn, hemû ev dijwariyêne di nav demeke kurt da ji ortê rabin û ev ferhengan ji, wê bîghêjin destê xwendevanan.

# Kuştına Olof Palme



Şeva 28' ê Sibatê seet dî 11.20'an da serokwezirê Swêd Olof Palme bî desteki xayin yê veşari hate kuştın. Kuştına Olof Palme lı Swêd û lı hemû cihanê wek dinamêtek teqiya. Bî kuştına Palme tevi gelê Swêd hemû aşti-xwaz, demoqrat û mirovhizên dinê ketin şinê, lı berxwe ketin û ev barbariya hanê ricimandin. Olof Palme bî aşti-xwazi, demoqrati û mirovhiziya xwe hatibû naskırın û bî kuştına wi derbeke mezin lı tekoşina aşitiyê, demoqrasiyê û mirovhiziyyê ket. Parastkarê heqê mirovatiyê Olof Palme bî destê dijminê demoqrasiyê û aşitiyê hate kuştın.

Kuştına Olof Palme çawa gelê dinê kırîbe şinê, her wusa em gelê kurd ji êşand û hezinand, lewra Olof Palme dosteki gelê kurd bû.

Komela me, KOMKAR-SWÊD jî ber kuştına Olof Palme du telgrafên serxweşiyê jî malbata wi û jî serokwezirê nû Ingvar CARLSSON ra verékir.

Bî belavokek Swêdi, Kurdi û Tirkî ev bûyer hate ricimandin.

Roja 8.3.1986 an da nêzi deh(10)

hezar biyani û rêxistinê wan ji bo giramiya Olof Palme lı Stockholmê civiya û vi barbariya hanê rûreş kîr. Dî vê civinê da komela me ji bî xurti ciyê xwe girt.

Roja 15.3.1986 an da lı Stockholmê jî bo definkirîna serokwezirê hêja Olof Palme civinek pêk hat û dî vê civinê da jî gelek welatan serokdewlet, serokwezir, mebûs, mirovên politik û berpirsiyarê rêxistinê navnetewi besdar bûn. Dî nav mîvanan da çend navên bijare hebûn. Wek: serokwezirê Yekitiya Sovyet Nikolay Ryzkov, sekreterê Partiya Komunist ya Elmania Rojhelat Erich Honecker, Serokdewletê Nikaragua Daniel Ortega, Xwediye xelata Nobel'ê rahip Desmond Tutu, sekreterê giştî yê Yekitiya Milletan Perez de Cuellar, Willy Brand, serokdewletê Hindistan Rajiw Gandhi, serokdewletê Zambiya Kenneth Kaunda, George Schultz, serokdewletê Finlandiya Mauno Koivisto û hwd.

## MESAJA KOMELE

Qetulkirîna Serokwezir Olof Palme ya bî barbari, bî berketînek jî dîl em pê hisiyan.

Olof Palme, miroveki bijare yê dewleti, parastkareki hêja bo aşitiyê, demoqrasiyê, heqên mirovatiyê û bêçekkirîna dinê bû.

Ew dosteki dilovan yên gelên bîdest bû û ew dostê gelê Kurd bû ji.

Em dî wê ditinê da ne, ku gulê lı Olof Palmê hatiye werkîrin, lı hêzên aşiti û demoqrasiyê hatiye werkîrin û em vi hovitiyê diriciminin.

Komela me KOMKAR-SWÊD( Komela Karkerêñ Kurdistan Li Swêd) êşa we parvedike û piştgiriya xwe diyar dîke. 3.3.1986

# Jİ NAV WEŞANAN

## ZARAVÊ SULEYMANIYÊ


\* *Di nav weşanêن "Akademiya Zanistîyan Ya Yekîtiya Sovyet" da, pirtûka Zera Usîv ya nûh hate çapkîrin, navê pirtûkê "Zaravê Zîmanê Kurdi Yê Suleymaniye" (Suleymanskiy Diyalekt Kurdkova Yazika 1986 Moskova). Zera Usîv di nav rûpelên vê lêkolina xwe da vi zaravê Kurdi, ango Zaravê Suleymani(Sorani) analiz dike, vi zaravê modern ji xwendevanan ra dide nasin. Berpirsiyariya vê efrandina hêja, beri mirina xwe Qanadê Kurdo hildabû ser xwe. Çawa tê zanin Zera Usîv li bal Qanad mezîn bûye, xwe gihandîye û xwendekarcke wi bû.*

## ROJA NÛ

\* *Kovara "Roja Nû" ya ku di navbera salêن 1943-1946'an da li Beyrudê hatîbû çapkîrin, vê carê hemû hejmarêن wê wek berevokekê bi hevra ji nû va hate weşandin. Berevok li Stockholmê di nav weşanêن "Jina Nû" da derketiye.*

## Û BAHAR HAT

\* *Romana Hecîyê Cindi ya bi navê "Û Bahar Hat" vê carê li Erivanê bi zimanê Ermeni hate çapkîrin. Bi vi tehri ev romana hêja heta niha wek em pê dizanin bi sê zimanan va hate weşandin, Kurdi, Rûsi, Ermeni.*



## KOMARA

### DEMOKRATİK A KURDISTAN (MEHABAD)

\* *Li ser Komara Mahabat pirtukeke nûh bi zimanê Kurdi li Stockholmê der çû, pirtûk ji aliyê Kerim Husami da hatîye nivîsan-din û navê wê waha ye, "Komara Demokratik A Kurdistan" (Mahabat).*

## İSOT

\* *Piştî derketina kovarên Mizgin û Mirkut vê carê kovareke mizahi bi navê İsot hate weşandin. Ev kovara bi taybeti bi karukaturan va hatîye çapkîrin. Berpirsiyare kovarê karukaturist Mamosteye.*

## EM BIXWÎNIN

*Ji bo zarokêن kurd bi navê "Em Bixwinin" pirtukeke xwendinê li Swêdê hat çapkîrin. Ev pirtuka bi rengin û bi wêne bi taybeti, zarokêن ku nûh dest bi xwendinê kirine, ji bo wan hatîye amadekirin.*

## BANDEKE

## NÛH

Bi destê KOMKAR li Elmanya Federal, bandeke nûh derket, navê wê "Muzika Kurdi A Modern" e. Li ser vê şeridê gelek stran, melodi û perçeyên muzika kurdi, bi awaki modern, bi gelek enstrümentên cure-cure va hatîne amadekirin.

## XEBATEKE HÊJA LI SER KURDZANIYÊ

Lî yekitiya Sovyet lî ser Kurdzaniyê berevokeke lêkolinê cu da - cu da hat weşandîn, pûrûk dî nav weşanêن "Welat û Gelên Rohilata Nêzik û Navin" da derketiye û jî 286 rû-pelan pêk tê. Berprisîyariya vê xebatê Prof. Şekroyê Xu do hildaye ser xwe. Dî nav rû-pelêن berevokê da gelek lêkolinê Kurdzanêن Sovyet lî ser dirok, ziman, huner û etnografiya Kurdan cih girtine. Navêن van lêkolinan û niviskarêن van wek lî jêr, em pêşkêşî xwendevanan dîkin.

- Çend Pirsên İdeolojiya Tevgera Kurda Ya Netewi Û Azadariyê Di Etapa Niha Da, **ŞEKROYÊ XUDO.**

- Tevgera Netewi - Demoqrati Kurdistana İranê, Di Nav Salêن 1960 - 1970, O.I.JIGA-LINA.

- Serhildana Kurdan Ya Sala 1925' An, M.A.HASRETYAN.

- Jî Diroka Pêwendiyêن Ermeniyan - Kurdan, X.M.ÇATOEV.

- Rûpelek Jî Pêwendiyêن Ermeniyan - Kurdan Yêن Diroki - Çandi, CELÎLÊ CELÎL.

- Pêwendiyêن Ermeniyan Û Kurdan Yêن Çandi, KARLANÊ ÇAÇAN.

- Derbarey Jiyin Û Efrandariya Helbestvan Û Dirokzana Kurd Ya Nivê Sedsaliya 19. Şah Şerefxanîm Kurdistani, E.I.VASİLEVA.

- Derbarey Pırsa Pêkhatina Mirtiya Colemergê (Heqariyê), A.I.XAÇATRÎYAN.

- Belavbûna Dinê İslâmê Di Nav Kurdan Da, Di Sedsaliyêن 7 - 9' An - Angori Çavkanîyên Ereba Yêن Sedsaliyêن Navin, A.P POLATYAN.

- Şaxêن Destana Kurda Ya Dîmdimê, HECÎYÊ CINDÎ.

- Çend Pirsên Folklorzaniya Kurda Yên Sazbendiyê, NÛRA ÇEWARI.

- Navê mexsus Di nav zimanê Kurdi Da, QANADÊ KURDO.

- Qeydên Hevbendiyêن Kurdi Yêن Morfologiye Di Dema Niha Da, MAKŞİMÊ XEMO.

- Dewsnavê Enklitik Di Çêkirina Hevokan Da (Ser Himê Zimanê Kurdi), ZERA ELÎ.

- Merc Û Curêن Bijartina Bûkê Û Zavê, Di Nav Kurdêن Ermenistanê Da, MEMOYÊ XALIT.

- Derbarey - Xuşk Û Bîrêن Axiretê - Nava Hebandîna Ezdiyan Da, G.S.ASATRÎYAN.



Dî sala 1978'an da lî Danimarkê dî temâsegehekê da quncîkek lî ser mal, jiyin û kîncêن Kurda hatibû vekirin. Ev sûretê jorin jî wê temâsegehekê hatiye kîşandin.



BIHA: 10:- kr.